


OROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebî



28
1990

NAVEROK

Studyoya sinemayê hat sazkirin.....	3
Alîm, pedagog û folklorzanê mezîn	
HeciyêCindi çi ser heqîya xwe.....	4
Bang jî bo ronakbirêñ Kurd, Abdulraqib Yusuf	6
"Kose Geli" yan ji "Kalîkê Serê Salê, Vazgal.....	11
"Dabeşkareki" Türk İsmail Beşikçi.....	14
Serhildana Agri (1926 - 1930), Dilsoz.....	16
Peyvîn Dûhev/2, Vazgal.....	24
Tiyatro: "Welatê Mîn Dî Dilê Mîn Da Ye"/4.....	26
Sare Toş, Münzûr Çem.....	29

Bergê pêşin : Didemek ji çiyayê Nemrût (Bîtlis)
Bergê paşin : İhsan Nuri Paşa û jîna wi Yaşar Xatûn

Sal: 11

Hejmar: 71, Heziran 1990

ISSN 0283-5355

KWEDİ: KOMKAR-Swêd

BERPIRSİYAR: Şêroyê BOTAN

NAVNİŞAN: Gustavslundsv.168,1 tr
161 36 STOCKHOLM

TELEFON : 08/26 23 75

HESAP NO: PG. 458980 - 0

UTGIVARE: Svensk Kurdiska

Arbetsföreningen

ANSVARIG UTGIVARE: Ş. BOTAN

ADRESS: Gustavslundv. 168, 1 tr.


161 36 STOCKHOLM

FAX: 08/26 23 75

Studyoya sinemayê hat sazkırın

Karkerên redaksiyona Roja Nû, roj baş!

Ez û hevalên min, xwendavanê ko-vara we, bî dîl û can lî we silav dikin. Jî we ra, spas dibêjin, jî bo hevaltiya we yê dilsoz. Eva sê hejmar e ku em lî pey hev jî we distinîn. Em bî çavêن birçi wan kovaran dixwinin û her tiştên lî wir jî me ra hewaskar in. Pişti gavêن we yê berbi hevaltiyê, em jî dixwazin û wext ji hatiye ku em dengê xwe derxin. Xêن jî xeberên spasi û razibûnê, em dixwazin agahdariyekî mizginiyê jî bo hemû Kurdên cihanê bîdîn. Lê berya ku ez dest bî agahdariyê bikim, ez ê bî pêşgotineki kurt weha bêjîm, da ku hemû gel, bê gili, hewce ye ku bî propagandeki şireh di derheqa jiyana me da gelên dinê bide hisandin. "Pêwest e sinema wi hebe!.." Lenin bî xwe ji weha digot... Lê çawa ku xwedi û xudanê me tune, pêwest e em bî xwe di nava zehmeti û problemâna da kar bikin. Bî kurti, me, deh kesen Kurd, (pênc xort û pênc keç) li bajare Tîblisê bî qeweta xwe "Studyoya Sinemayê" çêkir, û jî Hezirana parin vîrda em haziriya xwe ya tekniki, materyal, dramatûrji û teoriyê pêk tinin. Rojeki zûtir em ê filmên xwe bikşinîn.. Rast e, problem û astengiyêne me yê studyoyê pir in û bê-hesab in, lê eva me natırsine, jî bo ku navê studyoya me ji "Hêvi" ye û em optimist in (dîlpak). Em hêvidar in, ku em ê jî gelê xwe ra kareki hêja bikin. Mafêñ me ên yekemin ev in, ku hemû tişt jî bo Kurdan bikşinîn. Dî hukumeta şoreşê ya "internasyonalist" da hêj di derheqa Kurdan tu kes tiştek nebihistiye. Hilbet, wexta bibihizin, wê hingê wê ode ji bîdîn me û alika-



riyên din ji. Em yek bî yek teknikê hin dîbîn û hacetên dîkîrin, çêdîkîn, bî dest dîxîn...

Em hêvidar in, ku hûn ê vê gaziya me ya xêrê hêjayi çapkîrinê bîbinin û hemû Kurdan pê bîdîn hisandin. Ez her usa ji dixwazîm, ku navnişana xwe bîdîm xwendevanê Roja Nû, û yêñ ku bîxwazin di derheqa me da bî hûrgili agahdari bistinîn, em ê bî dileki şad bersiva wan bîdîn.

Dibe ku yeki Kurd bîxwaze alikariyê bide me, jî aliyê tekniki, pêşniyari, şiret, bî peran, bî dramatûrjiya Kurdistanê û hwd. ku em ê gelek pê razi bîbin.

Geli bîrayan, axîr iro ev hevkari û piştgiri jî me ra eseziye û gîring e. Çawa ku siyasetvanê me yê hêja Kek Kemal BURKAY dibêje: "Roja rizgariya Kurdistanê rîal e. jî ber ku cihan bî aliyê me da vedigere." Ez hêvidar im ku ev niyeta han zê here seri...


Û her weha, em endamên koma studyoya "Hêvi", Kurdên dîlbîrin, dixwazin jî hemû Kurdên Kurdistanâ dî bîn zulmê da, girtiyen zindanan, pêşmergeyan ra bî qêrin û bang bîbêjin: Birano, xwişkno, dayikno û bavno, em ji tevi we ne!..

Em disa xeberên razibûna xwe jî we ra dibêjin, em hêvidar in ku hûn ê jî bo me vê miqalê çap bikin..

Bî dîlêñ germ û Kurdperwer li hemû Kurdan silav dikin. Dibe ku weha rasttir be, eger em bêjin: Wê Kurdistan çê bîbe!..

**Xwendevanê İnstituya Tiyatroyê,
Endamê Studyoya HÊVI
Casimê WEZIR**

Alîm, Pedagog û Folklorzanê Mezin HECIYÊ CINDÎ Çû Ser Heqîya xwe



Dî 1'ê Gulana 1990'i da alîm, Kurdnas, folklorzan û pedagog Profesor Heciyê CINDÎ ji nava me bar kîr û dî 82 saliya xwe da çû ser heqîya xwe. Bî gotîneke kurt û dagirtî, Heciyê Cindi alîm û zanyareki mezin bû. Ew heta dawîya emrê xwe insaneki kîrhatî bû û bi efrandinê xwe xezineke gîranbuha jî gelê Kurd ra hişt, dî nav gelê kurd da ciheke pîr bi rûmet û payebilind peyda kîr û çû.

Heciyê Cindi alîm û nîvîskareki Kurdên Yekitiya Sovyet bû. Nav û dengê wi ne tenê li nav Kurdan, her wîsa dî nav gelên Yekitiya Sovyet û ciran da ji belav bûbû. Ku wek nimûne dî 70 saliya xwe da li Yekitiya Sovyet bî nişaneke mezin, nişana "Dostaniya Gelan" hatîbû perûkîrûn û pirozkîrûn.

Heciyê Cindi dî sala 1908'an da li gundê Emençayîrê (gundeki Dîgorê ku girêdayî Qersê ye) hatîye dînê. Malbata wi bî çandîni û heywan xwedikîrinê xwe aborandîne. Dî bûyerê 1917-18'an da Kurdên Êzidi ji wek Ermeniyan zûlüm û zordariya dewleta Osmani ditin. Dî wê demê da, Bî gotîna Heciyê Cindi, "leşkerê Romê" 16 gundê Êzidi şewitandin û mîrjin hemûyan qırkîrin. Heciyê Cindi ji jî çend zarakîn xîlasbûyi bû. Anglo ji malbata Heciyê Cindi tenê ew filîtibû.

Jî sala 1919'an heta 1929'an dî êtimxaneyeke Ermenistanê da dîmine. Li wê derê hini Ermeniki dîbe, perwerdegariya dîbistana yekem û navin temam dîke. 1930 da li gundê Kûndaksîzê, ku gundeki Kurdan bû, dest bi

mamosteyiyê dîke. Piştre, li zaningeha Mamosteyi ya Kafkasê ya Kurdi mamosteyiya xwe dîdomine. Demekî dûr û dirêj di redaksiyona Riya Teze da dîxbîte û alikariya Rad-yoya Kurdi ya Erivanê dîke. Disa demekî dûr û dirêj, li Enstituya Edebiyatê ya Akademiya Zanisti ya Erivanê dîxbîte û serokatiya Seksiyona Nîviskarêne Kurdi dîke. Piştre, li eyni Akademiyê li Enstituya Ilmêne Rojhîlat xebatê xwe dîdomine.

Heciyê Cindi alîm û nîvîskareki pirali bû. Ew berya her tiştî dersdareki hêja bû, ku jî bo dîbistanê Kurdi gelek materyalên dersê amade kîribû.

Ew folklorzan bû, ku dî vi wari da gelck berhemêni wi hene.

Ew kulturzan û zîmanzan bû, ku gelek lêkolînêni wi yên hêja hene û jî ber van xebatê xwe dî 1978'an da nişana "Dostaniya Gelan" wergirt ku biryarnama vê nişanê jî ali Prezidîyuma Bîlînd a SSCB, bî imza Leonid Brejnev û M. Georgadze hatubû dayin.

Berhemêni wi yên ku jî bo dîbistanê Kurdi hatîbûn amadkîrin ev in:

Ala Sor, 1932.

Jiyina Nû, 1932.

Cihana Nû, 1932.

Kolxozavê Dersdar -Alfabe- 1933.

Pîrtûka Dersêni Zîman, 1935.

Alfabe û Bîngîhêni Xwendînê, 1937.

Pîrtûka Dersêni Zîman, 1937.

Alfabe, 1946.

Zîmanê Dê.

Li ser folklora Kurdi lêkolînêni hêja eftîrand.

Berhemên ku di vi wari da hatine çapkırın ev
in:

Folklor Kurmancı, bî hevkariya Eminê Evdal,
1936.

Ker û Kulik (ya Silêmani Silivi), 1941.

Şaxen Eposa Koroxli, 1953.

Mem û Zinê, 1956.

Folklor Kurdi, 1957.

Çirokên Kurdi, çar cild, 1961-1962-1969-1977.

Kîlamân Cîmaeta Kurdaye Evinlyê, 1979.

Mesele û metelokên Cîmaeta Kurda.

Digel van xebatê hêja, Heciyê Cindi, cilda
5'an a "Çirokên Kurdi" û ferhengeke Kurdi-
Ermeniki ji, ku ji 30.000 peyv pêk tê, amade

kiriye.

Heciyê Cindi bavê keçan bû û bî xebatê
xwe yên gîranbuha li ser malbat û merivê
xwe yên nêz tesireke baş peyda kîribû. Dî mal-
bata wi da gelek zanyarê hêja derketine. Me-
selâ xwarziya wi Nûra Cewari, li ser muzika
Kurdi lêkolinê hêja kiriye. Zavayê wi Şek-
royê Xido, tarixzaneki bî nav û deng e. Disa
zavayê wi Tosinê Reşit, piyes-nîvîskar û
şaireki baş e. Ferikê Üsif, ozaneke naskiri ye.

Alimê me yê mezin bî laşê xwe ji nav bar
kîr çû, lê bî berhemên xwe yên gîranbuha di
dilê me da diji û wê tim biji.

DERHEQA TELGRAFEKE TARİXİ DA

Elixanê Memê

Dî van axiriyen da di derheqa telegrammeke V.I.Lenin da
geleki xeber didin. Gelek caran ewê (telegramê) di nava
mîqalan da tinin zuman. Lema ji, bî texmina mîn, lazîm e
ku tarixa wê telegramê binine ber çavan.

...Sala 1921 da li Azerbeycanê banka rîspûblikayı (gelê-
ri) ya dewletê vedibe. Bona wê yekê sedrê Sovyet a komis-
arêni Azerbeycanê yê cîmaetiyê (cîvaki) N.Narimanov di
14'ê Çiriya Paşin sala 1921'i da telegramê ji V.I.Lenin ra
dişine û di derheqa vekîrîna banka dewletê da agahdarî dide.
Narimanov dînivise, ku ew şayneti hatiye darbâzkîrin: "Dewsa şaynetiya sade bî hesabê wan çil (40) milyon manat
pêşkêsi birçiyê Poveljiyê û Kurdistanê kîrine", ku ev diy-
arbûna tifaqdariya (hevğirtuna) proleteryayê ye, izbatîyeke
yekitiya proleteryaya Kavkazê û Ünistanâ teze ye.

V.I.Lenin eva yeka li ser telegrama N.Narimanov
nîvisiye: "Caba (bersiva) kurt hazır kin". Hema bî vi
cûreyi ji, telegramê di arşîva İstituta Marksizm-
Leninizmê ya partiyê ya merkezi da li rex KM- PKTC da
tê xweykirûnê.

Bî destê merîveki neeyan teksta telegramê tê hazirkîrinê.
Lenin qal dike û di navbera 17 û 21'ê Çiriya Paşin a sala
1921'i da dişinîn. Teksta telegramê wchaye:

"Telegram, Bakû, Jî Sedrê Sovyet a Komîsî-
rêni Azerbeycanê yê Cîmaetiyê Narimanov ra.

Ez dixwazîm, ku banka dewleti ya Azerbey-
canê ya teze vebûyi dî destê pale û gundiyan
rîspûblika Sovyeti ya bîratîyê da bîbe himê
politika ekonomiki yê teze yê qewi. Ev yek,
weki pêşkêskîrîna çil milyon ji bo birçiyê
Poveljiyê û Kurdistanê, şehadetiya hazırlûnê
yê heri baş e di bin ala İnternasyonal a sor da
ku pêş da herin.

Sedrê Sovyet a Komîsîrêni RÜSSF Cîmaetiyê,
Lenin"

Ev telegram cara yekem di sala 1950 da di neşîrkîrina

efrandinê V.I.Lenin ê 4'an da (Cild 33, rûp: 100) bêyi
agahdariyê ber ra hatiye neşîrkîrinê. Jî wê şunda ev doku-
menta tarixi di neşîrkîrina efrandinê V.I.Lenin ên mayin
da neşîr bûye (Dî derheqa telegramê da bî aşkerakîrin û na-
siyîn teze va). Jî wi ali va neşîra sala 1965'an berbi çav e.
Ew telegram di cilda 54'an da, di rûpelîn 21-22'an da ha-
tiye neşîrkîrinê bî agahdariyê anegor va, ku şehadetiye
didin, weki telegram bî ci manê hatiye şandîn. Ev telegra-
ma han di wan neşîrîn efrandinê V.I.Lenin da heye, ku
di salêñ cihê cihê da bî zimanê Ermeni ronkayı ditune.

Dî telegramê da navê du ciyan, Poveljiyê û Kurdistanê
hatiye kîşkîrinê. Eger dî derheqa Poveljiyê û xelaya wê
derê da be, di wan salan da şagîrîn mekteban ji zanîn, lê dî
derheqa Kurdistanê da vê yekê nikari bêji. Wextekê jî bona
navhîdana wê cihi, meriv bî politiki dihatne gunek-
kîrinê.

A.Bükşpan di kitêba xwe ya "Kurdêñ Azerbeycanê" da,
ku di sala 1932 da li Bakûyê ji ali para rojhîlat a İstituta
Bakûyê ya Udmîzgeriyê ya dewletê da bî zimanê Ürisi
neşîr bûye, dînivise ku peyva navê "Kurdistan" cara pêşin
di sala 1923'an da hatiye xebitandinê. Lê çawa ku me dit,
peyva "Kurdistan" zû va hatiye xebitandinê, him di Sovyeta
Komîsîrêni Azerbeycanê ya Cîvaki da, him ji di Sovyeta
Komîsîrêni RÜSSF Aa Cîvaki da bûye objekta (babeta)
politikyê. Lî vê derê dî derheqa bext û qedera Kurdistanê da
fikirine, çunki him di salêñ şerê hemdînyayê yê pêşin da
him di wextê rîspûblika Azerbeycanê da, him ji di wextê
tesdiqbûna diwana Sovyetiyê da li Azerbeycanê Kurdistan
bûbû cihê hevketûnê politikyê û şerê navbera mîletan,
çavê zevîkarê (dagîrker) welatên dereke li ser wê bû. Lî
aliyê din ji, beg û xanêñ ci ji cîmaet talan kîribûn. Mîlo-
nîn pêşkêskîri, ji bo Kurdistanê bûne delil ku ji nava
çencikê xelâyê derê.

(Transkriptekar ji kirili: Salih)

'BANG JI BO RONAKBİRƏN KURD'

Ev nivisa han ji pirtûka Abulraqib Yusuf hatiye wergirtin. Navê pirtûkê "Bang ji bo ronakbirên Kurd" e. Pirtûk bî zaravê sorani hatiye nîvisandîn. Beşa "Li ser çand û sinetê Kurdan" (rûp: 102-121) ji bo Roja Nû hatiye amadekirin.

ABDULRAQIB YUSUF

Bêguman lı Kurdistanê sinetê çêkirina şikil û wêneyan ji Sedsala Navin dînizile û tê. Dî berhemên dest-nîvis da, wek minak dî pirtûkê Mirhan Mensûrê Mirhan ê Farqini da hatiye nişandan ku dewra çêkirina wêneyan, ku dî pirtûkê wi da hatine nitirandin, dî Sedsala 12'an da derketine holê. Wêneyê ku hene lı ser insan, gil û giya û lı ser ruhberên dîn in û bedewiya wan wêneyan dîde xuyan ku hunermend meriveki hoste û bi qabiliyet bûye. Ev berhemên han nîha lı Pirtûkxana İmam Rıza, lı bajarê Meşhedê ye (Iran). Bêguman lı İranê ev wêneyen gîranbîha û hunerên han



Wêne: 1

çend caran lı Ewrû-payê lı ser navê sine-têni islami hatîne ra-xistin. Lêkolinvanê rojhîlatnas dî temaşe-gechê da fotografê wêneyen nava vê pirtûkê kişandînê û lı ser van berhemên gîranbîha nîvisine. Me ji çend sal berê ji pirtûkxanê (Pirtûkxana İmam Rıza) fotokopiyê wan wêneyan xwest, lê mixabîn ku pirtûkxanê daxwaziya me qebûl nekir.

Dî niveka Sedsala 12'an da İbnul Rezazi Cîziri, bî sinetê wênevaniyê nav û dengê xwe daye hisandîn. Dî eyni wextê da Cîziri, alîmekî mezîn bûye, dî şaxê fizik û kim-yayê da xwedi zani-neke fireh bûye û dî vi

wari da pirtûkeke wi yê lêkolinê ji heye. Navê pirtûkê, "Pivanê Mekanik" e. Ev alîmê mezîn pirtûka xwe li bajarê Amed (Diyarbekir) nîvisiye, wêne, şikil û formulên navginan ên cûrbe cûr çêkiriye. Dî wêneyêن xwe da gelek navginêن cihê, wek saet û navginêن ku gundi di çandîniyê da bî kar tinin li ser kevîran kolandiye. Ev alîm û hunermendê hêja yê kurd, ji Cizirê ye. Cizir, dî navbera Sêrt û Mêrdinê da ye, bajareke kevn ê Kurdan e û lî qerexê Çemê Dicleyê hatiye avakîrin. Wêne û berhemêن ku jî ali Mirhanê Farqini û Rezâiyê Ciziri va hatîne çêkîrin, dî pirtûkxana wêne ya Bexdadê da wek berhemêن bingehin ciheke sereke dîgrin. Mîhemedê Osman ê Hesenkêfi, şagîrteki navdar ê İbnul Rezazi ye. Ew bî xwe ji Botani ye. Muzaferê Huseyn ji, dî warê muzikê da hunermendeki hêja ye. Ev hunermendê hêja bî Erebi, bî navê "Lî ser sinetê muzikê lêkolinek" (Resaleti elkaşif fiti, ela nizam" pirtûkeki nîvisiye. Nîmûneyek jî vê pirtûkê. (tarix tune), nîmûna dudyan niha dî Pirtûkxana Ayasofyaya bajarê Stenbolê da ye. Ev herdu sinetkarêن navdar (Mîhemedê Osman û Muzaferê Huseyn) Hesenkêfi ne. Hesenkêf li hêla Mêrdinê, li qerexê Çemê Dicleyê ye. Jî ber ku destnîvisa Muzafer gelek spehi bûye, Sîlêmanê kurê Xazi bî navê "El malîk el adîl" pirtûkeki dînivise. Sîlêmani Xazi mireki Kurd û zanayeki gelek mezîn bûye, nêzi 50 sali li Hesenkêfê miriti kiriye. Hunermendê hêja Muzafer, dî salên 1424 - 1425'an da çûye ser heqîya xwe. Bêguman li Kurdistanê hebûna çavkaniyêن sinetê wênevaniyê nayê inkarkîrin, lê jî bo ku merîv li ser xusûsiyetê sinet û çanda Kurdan vebe, wana kîfş bîke dîvê lêkolineki fireh bête kîrin. Ü dîvê ew berhem û hunerên diroki yên ku em ê kîfş bikin wek hunerên bingehin ên Kurdi bêne parastin. Dî hîn malan da wîsa kevirêن nîvisandi û bî wêne nexşkiri hene ku, mesela li Kela Hewlêre li mala Seyidê Ebdullah, ji wan keviran çar heb hene. Wêneyêن ser wan keviran, hunermendiya Eli Ekber û İsmailê Sîneyi ye. Disa li bajarê Sîlêmaniyê, dî mala mezîn yahûdiyan da wêneya du marê reş heye. Wêneya 226 bîlbilan dî takaya Şêx Ebdurehman da, dî nav nexşen çiçekan da ye. Lî hêla Şêxan wêneyêن du ma-

ran ku yet li ser mezelê Şêx Adî (mezîtinin şêx êzidiyan e û mezelê wi li Laleşê ye) û yet jî li ser kîlikê mezelê Şêx Mard hatîne çêkîrin. Dî van demêن dawin da li cih û warê rûnîşünê yên kevn ên Kurdistanê wêne, nîvis û şîklêen ku hatîne ditinê tenê şîklê insan, ruhberên cûrbe cûr, tir, şûr, xencer, hemayil û hwd in û xasîma piraniya wan li ser kîlikêñ mezelan têن xuyan. Jî ber vê yekê ye ku em dî havina 1977'an da çûn Kurdistanâ Tirkîyê û me fotografên gelek berhemêن weha kişand. Bî taybeti berhemêن ku bala me kişand, li "Aşê Hemo" yê mintiqâ Botan bû. Aşê Hemo li devera ku Çemê Bînyatê dîgîhîje Çemê Dicle hatiye avakîrin. Dî vê aşê da, li ser keviran wêneyêن insaneki û kûçikeki hatîbû kolandin û ew gelek bî can dîhatin xuyan. Kîncêñ wi insani ji, şal û şapîkê Kurdan bû. Wêneki dîn ji li ser mezelê Şêx Memo hebû, ku li gundê Fenk bû û ev gundê han dikeve rexê Dicleyê. Ev Wêneyêن ku me behsa wan kîr, li kujê heri seri yê mintiqâ Botan e. Ü wîsa xuyaye ku tarixa çêkîrinâ wan gelek kevn e.

Lî ali dîn gelek mezel, kîlikêñ gîring û nexşkiri di mezelixana Cizirê da hene. Bî rasti li ser mîzgeft, sîr û diwarên kevn gelek berhemêن giranbuha hene, û ev ji xezineyeke diroki ye ji çand û sinetê Kurdan. Mezelêñ ku wêneyêن mar dûpişk, zeynetên cûrbe cûr ên jinan, wêneyêن insan -ku kîncêñ Kurdi li ser wan in û hînek ji wan dilanê dîgrin- li ser wan in, gelet tişt ji insan ra rawe dîkin. Lî ser kîlikâ jînekê, ku navê wê Sultan e û dî sala 1824-25 da mirîye, wêneyê zarokek û dergûşek tê xuyan. Lî ser kîlikêki dîn ji, şervanek li hespê siwar bûye û dî desteki wi da şûr, tir û kevan û mertalê wi, dî destê dîn da ji tîvingeki û tûrê barûdê tevi du bazêñ nêçirê, du mar û çivikek, çend heb şîş û sturiyêñ pezkûvi û hîn tiştêñ bîçûk hene. Wêneyêن ku li ser kîlikêñ mezelan hatîne kolandin, ji bli nêçirvanîyê hîn işaretêñ dîn dîdîn destê me. Lî gor ditîna min ev, mezelê Mir Şerif kurê Mîhemed Beg e. Ev Begê han dî navbera salên 1792 - 1793'an da çûye ser heqîya xwe. Dî derheqa vi babetê da belgeyeki dîn ji dî destê min da heye. Dî destana "Neryê etno'ye" da Lawjê pir, ku bavê nêçirvaneki seyid e, him nêçirvanê Mîhemed


Begê Botani ye him ji dengbêjê wi bûye. Pişti mirina Beg, ev dengbêj lawjeki efirandiye û ew hemû wêneyên ku li ser kevirên mezelan hene di lawjê xwe da nitirandiye. Lî ba min pirtûka lêkolinvanê fidakar û ronakbir Mele Xelilê Boti, ku bî baleki mezin li ser wêneyên kêlikan sekiniye, heye. Ew li ser kêlikên mezelan gelek xebitiye û li gor encama xebata xwe, van agahdariyan dide me. Tam 11 mezelê Mirê BABAN -ku yê heri mezin Ebdurehman Paşa ye- di mizgefta mezin a Silêmaniye da ne. Lî ser kêlikên wan wêneyên çivik û heywanên firoke hene. Lî mintqa Botan, li mezelgeha gundê Heci Ebdullahê Zivingehi çend kêlikên nexşkiri hene. Eyni ji wan kêlikên nexşkiri di dibistana Feqiyê Teyran ê Finki da ji hene. Ev mezelên han me digihinin wê baweriyê ku, ew mezelên mirityên Finkê ne. Lê mixabin ku me imkana lêkolina wan mezelan nedit. Gundê Hizanê, ku cih û wareki kevn ê Kurdan e, pir berya islamiyetê ji cih û na-wenda mirityên Kurdan bûye. Lî vê der ji, çend kêlikên tarixi, kevn û nexşkiri hene. Me di 10.8.1977'an da fotografê wan kışand. Wisa tê gotin ku, yek ji wan mezelên kevn a Sinem e. Ew Sinema ku stranê wê gihiştiye heta mintqa Koy (qezayeki Kurdistanıraqê). Mixabin ku me nîkaribû nîvisen ser wan kêlikan ji hev derxin û bixwinin. Di mezelgeha qeza Ranîyeyê da, li ser kêlikê mezelan şîklê simbilên genim hatiye kolandin. Ev ji nişan dide ku, deşta wê derê bî xêr û bêr e, erdeke çandiniyê ye.

Her weha ji bo me aşkera dibe ku, li ser

kêlikan çêkîrina wêneyan, kolandin û nexşkîrina keviran çavkaniya sinetê Kurdan ên bingehin û esli pêk tine. Jî ber vê yekê pêwist e ku hemû tuşt bêne parastinê, jî bo lêkolinê nû xebat bête kîrin û di derheqa tiştên nûkifşkiri da bête nîvisandinê.

Lî ser keviran sinetê kolandin û nexşandina wêneyan ên Kurdan, bi sinetên neteweyên din rapêwendiya xwe heye. Lewra rasti ew e ku, di sinetê wêne da hemû neteweyên dinê li ser hev tesir dikin û ji hev tesir dîgrin, di nav pêwendiyike organik da ne. Mesela, sinetê Rojhîlata Dûr li ser sîncê wênekêsiya islami tesir kiriye. Evya him di wêneyên ruhberan da him ji di yên xeyali da xwe nişan dide. Her weha ev tesirkirin û tesirgirtin di dema Moxolan da zêtür tê xuyan. Destnîvisen bî wêne yên wê demê aliyê vi babetê datine holê. Mesela, destnîvisa "Mîrati Elhegwan" û ya pîsporê ten-duristi yê dewletê "Ubeydullah Bextîşvê", bi

alikariya dosteki û li ser daxwaziya Mehmûd Xwozan di sedsala..... (tarix tune) da bi zimanê Farisi hatiye wergerandin. Wêneyên wê derê aşkera nişan didin ku, di bin tesirê da mane. Hinek wêneyên wek vana ji, niha li bajarê Newyork li pirtûkxana Morganê ne. Numra wan wêneyan, 500 e û li ba me ji fotografekei wan ê kîşandi heye. Ev pirtûka destnîvis di Sedsala 15'an da dîkeve destê Şemsedin Begê kurê Ziya Eleddinê Rojiki, ango mitiya Bedlisê. Ev mirê han xwedi pirtûkxaneke mezin bûye. Navê vi Mirê Kurd, li ser qapaxê dawi yê vê pirtûkê hatiye nîvisandin û çar aliyê wi bi nexşan ha-



Wêne : 2

tiye hemîlandın. Dibe ku ev berhem dî pirtûkxana Ebdullah Beg da be û gava ku Me-lik Ahmet Paşa (Paşayeki Osmaniyan. Bînêre: "Gernama Ewliya Çelebi) berhemên pirtûkxana Ebdullah (Evdal Xan) talan dîke, bî dest xîstibe.

Her weha dî warê tesirgirtin û tesirkîrînê da ji, Pirtûkxana Bexdadê ji sinetê wêne tesir digre. Û evya bî awayeki xweş dî sinetê wênevan Mani da xwe nişan dîde. Mani, merîveki dindar û wênevaneki gîhiştî bû. Ev merîvê hêja dî Sedsala 3'an da jiyaye. Sinetê Iranê ji, dî bin tesira sinetê Ewrûpaya Sedsala 16'an da maye û ev ji xwe dî tabloyê ser diwaran da nişan dîde.

Bizansi, gelek wêneyên ruhberan ji Asûri û Iraniyan wergirtine. Çawa dî sinetê wênewaniyê da Iran ji dewra Ewrûpayi û Fatîmiyên Mîsîri tesir girtibin, wîsa ji tesir kîrine. Wek çavkani lî pirtûka "**EI teswîr el islami fiti el Asûr, el Qâhire, Hesen Paşa**".

Dî babeta tesirgirtin û tesirkîrînê da hînek nexş lî ser peran ji xwe nişan dîde. Ev nexşen han lî ser perên Kurdan ji têx xuyan. Mesela, dî dewra mirîtiyên Bedlis û Cîzirê da, angò dî dewra mirîtiyên Şerifê Mehmûd û Mir Ebdullah (Evdal Xan) da têx xuyan. Nexş û şîklîn vê dewrê (dewra mirîtiyên Kurdan) piştre lî ser perên Safeviyan hatîne niturandin. Ew (Safevi) lî van şîkl û nexşan xwedi dertêñ û iddia dîkin ku, ev nexş û şîklîn han ên dewra Şah İsmail û Tahmasb in. Lî ev nexşen han bî emîr û kevnitiya xwe ji dewra Safeviyan kevintir in. Dibe

ku ew, van nexşen han ji mirityên Türkmenên Akkoyûni û Karakoyûni wergirtibin.

Bîzenti çawa ji sinetê mînîtiqa Diyarbekir te-sir girtibin, ew ji eyni wîse bûye. Ev ji xwe dî wêneyên Mîhran û Ibnul Rezâziyê wênevan û dî wêneyên sinetkarêñ dîn da nişan dîde. Ev tesirgirtin dîghiye Sedsalê Navin. Gelek wêne û berhemên "Zanîngeha Wênewaniyê" ya Diyarbekir lî pirtûkxana sinetê wêne ya Bexdadê da cîviyane. Ev ji, pêşda bî lêkolineki kûr û fireh lî ser sinetê wênevanîya islami, ku vê mînîtiqê ji distîne çapa lêkolina xwe (ji Mîrîdin heta Diyarbekir), tê ditin. Wê çaxê wê wek rojê sinetê Kurdan ên taybeti û serbixwe de-rêñ meydanê, wê mora Kurdan lî ser wan be û her weha wêne û berhemên Kurdan lî pirtûkxana wênevani ya Bexdadê windë nebe.

Bêguman heta iro lî Kurdistanâ Iraçê alîmên hosta, gîhiştî û bî qabilîyet (dî warê sosyoloji û arkeoloji da) derneketîne, ku wek Zeki

Mihemed, Hesen Hu-seyin Elbara, Ebdul-eziz Mîrzuk bîkarîbin lî ser sinet û çanda neteweyên Ereb, Tîrk, Farîs û Kurd lêkolîn bîkin. Bî rasti ji, lêkolîneke weha ne kare-ki hêsan e. Merîvê ku kareki weha bîde ber xwe, dîvî lî ser sinetê islami xwedi zanineki fireh be. Niha ronakbi-rêñ ku lî ser vi şaxê dixweynin ji, ne xwedi imkanîn fireh in, ji zanineki têr û tije mehrûm in û ji vê babetê zêde tişt fam nakin.

Dîvî merîv dî derhe-qa sinetênlî islami da lî ser pirtûkxaneyên dewra Abasi, Selçûki, Moxol, Safevi û Os-maniyan agahdar û zana be. Lewra dewra destpêka sinetê Kurdan



Wêne : 3

dı Sedsalên Navin da dest pê dîke û heta Şerê Cihanê yê Yekemin wek sinetê islami dom kiriye. Jı ber vê yekê riya lêkolinê û çavkani her ev e. Dîvê meriv dı vê babeta ji, xwedi zanineki fireh be. Dîvê bête zanîn ku, kijan pirtûk li kuderê ye û yê kijan pirtûkxaneyê ye û sıfat û xusûsiyetên wan yek bî yek ji hev bêne vegetandin, ji heqê vi kari bête derketin. Anglo dîvê meriv li ser tarixa islamê xwedi zaninek û lêkolineki fireh be. Wê çaxê meriv dikare xwe bigihine çavkaniyên hêja yê sedsalan û wana derxe ronahiyê, lê mixabin ku haya sinetkarêne me ji van sinetên giranbuha tune. Lı bajarêne xwe bî xwe ji, derheqa wêne û lêkolinê kevn ên tarixe da ne xwedi agahdariye-ki ne. Ü eger derheqa wêne û sinet da piçek agahdariya wan hebe ji, ku ji bir nekîribin, ev agahdari tenê derheqa pirtûkxaneyên nû yê Ewrûpayê û sinetê biyani da ye û ji wi zêdetir ji nine.

.... Me tucar xwe bî zeman û dewreki va, bî tarixa Kurdan va gîrêdayi nehiştiye. Anglo me nexwestiye ku em tenê bî dewreke 100 yan ji 40-50 sal va gîrêdayi bîminin û ji bo me çarçeve ew be. Em qimet dîdin hemû tiştên kevn û lêkolinêne ku hatine kîrin. Heta iro 12 cûre berhemên xebat û lêkolinan hatine hazirkîrin. Dî ser van berheman da 50 sal ji derbas bîbe, meriv dikare bî hostati û zireki lêkolinê bîke. Ji bo hemû ronakbir û welatparêzên Kurd berpirsiyari ew e ku, berhemên çanda xwe ya neteweyi ya belavbûyi lî hev bîcivinin û bî tu awayi vê wezifê navêjin pişt guhê xwe.

Cilda pirtûka me ya duduyan ji, ya "Hizareti el dewleti el Dostki fi Kurdistan, el usti islami" (Lı ser Dewleta Kurd a Dostki), 492 rûpel e û ji 234 çavkaniyan pêk tê. Ji bo wan 234 çavkaniyan, ji 300 çavkaniyên din kelk hatiye girtin. Me pêwist nedit ku navêne wan binivisin. Ev çavkaniyên han ji heft zimanen cuda pêk hatibûn, ku yek ji wan zimanen ji zimanê Suryani bû. Ez bawer im ku heta iro tu alîm û lêkolinvaneki Kurd, ji bo pirtûka xwe ewqas çavkani bî kar anibe. Ji bli vana, em, ji bo gelek çavkaniyan li gelek cihêne dûr geriyan.

Çend pirtûkên destnîvis ku wek çavkani ji wan kelk hatine girtin ev in: Yek jê lı

Pirtûkxana Morgan a Newyorkê, yek jê lı Pirtûkxana Akademiya Zanisti ya Oksfordê ya Budilyon, lı Pirtûkxana Muze ya Ingiltereyê pirtûka "Dar el kitib volvok el kumiyeti" (Belgîyêne lı ser tarixa neteweyan) û "Mehd Muatâtat Came El Dul El Erbiyet" (Belgîyêne Tarixi yên Neteweya Ereb) in.

Ev pirtûk dı 1975'an da hate çapkırın, lê ji bo belavkirina wê destûr nehat dayin. Ev herdu cild ji 900 rûpelan pêk tê. Tê da dî derheqa "Dewleta Dostki ya Kurdan" da gelek agahdariyên fireh û hêja hene, lê disa ji lı gor ditina min ew, ji suhbîta 86 saetên ku lı Silêmani, Seyid Sadîq, Çememal, Raniye, Jarava Bertest, cih û warêne deşta Gendi, Qelediz, Kerkûk, Hewlêr, Rewandûz bî kal û pirêne me ra hatin kîrin, hêjatîr nine. Lewra ev biranînen han bî mirina wan kal û piran wînda dîbe û dice. Bi van gotinêne me ji sexir nebîn û dîvê em bî dileki vekiri bêjin ku, em ji destpêkê, ji sifirê bî rê dikevin, em serboriya xwe yê kevn ji nû va fam dîkin û dicivin. Anglo em dixwazin ku, ronakbirêne me ji vê rîyê bîpejirin. Dîvê em ji bo cîvandin û aşkerakirina heyiyen xwe yê çandi bî dîlşewati bixebeitin û ji jiyana xwe gelek salan fedâ bikin. Lewra ev berhemên çandi yêne ku hene, ji bo xebata iroyin pêplükên pêsin in. Eger ji ali ronakbirêne me sisti bête kîrin, pêşda wê dirok û neviyên (torînen) me, me bikin binê sîcdariyeki giran.

Werger : Newroz / Dilsoz

TÊBINIYÊ WÊNEYAN

- 1) Ev kêlikê han lı mezelgeha Cizira Botan e. Hunermendê wêne û nexşen ser kêlikê Feqi Mihemedê Goveşî ye.
- 2) Kêlikên vê mezelê ya qiza Omer Şerif, Sultan Xanîm e. Mezel lı mezelgeha Cizira Botan e. Hunermendê vê mezela han ji, Feqi Mihemedê Goveşî ye.
- 3) Ev kêlikâ han ji ya Sultan Xanîma qiza Omer Şerif e. Hunermendê wê Feqi Mihemedê Goveşî ye.

"KOSE GELİ" YAN Jİ "KALIKÊ SERÊ SALÊ"

VAZGAL

Dı diroka insaniyetê da jî xelayi, belengazi û zordestiyê xilasbûn bî cejn û şayı tênen pirozkırın. Hin jî van şayiyan jî bo demeki kurt in, hinekên dîn bî naveroka xwe her berdewam dikin. Bî nexş û nigarêñ nû tênen xemilandin. Eger ew gel, geleki azad û serbixwe be hin çêtir pêşda dice.

Dema ku zivistan diqede, Kurd, dî destpêka bîharê da şayı û civin çêdikin. Yek jî wana ji Kose Geli ye. Kurd bî van şayiyan, xirabiyen jî ber malen xwe diqewirinin, jî belengazi û tunebûna zivistanêñ dirêj xilas dîbin. Bî kurti xwe jî sala pir vediqetinin, dikevin sala nû. Bî hêviyeki xurt dest bî sala teze dikin. Xwe amadeyê xebat û jiyana teze dikin.

Kurd, lî gelek cihen Kurdistanê bî navê "Kose Geli", "Gaxan", "Kal", "Kalik", "Bûk û Kose" û hwd. zivistana bêxer û sala kevn bîrédikin. Bî şayı û hêviyeki nû pê davêjin sala teze. Em dîkarin bêjin, ev şayiyêñ ku tênen çêkirin wek karnavalên Ewrûpayiyan in. Şayı jî ali grûbeki va tê çêkirin. Lî belê wisa dikin ku xelk jî tê da beşdar bibe, tevi grûbê wexteki baş biberine.

Em lî jêrê bî kurti behsa Kose Geli dikin. Lî mintiqe û parçen Kurdistanê hin cûdati hebin ji, bî naverok pirani nêzikê hev in. Jî ber ku wana jî bingeheki derketine. Dem hatiye, wext darbas bûne ev civin û şayı ji guhurine, jî ber tunebûna dewleteke me ya serbixwe ev edetê baş lî hin ciyan hatiye ji birkirin an ji kolonyalist lê xwedi derketine, jî xwe ra kırine mal. Lî belê niha ji di gelek gundêñ Kurdistanê da ev şayı tê çêkirin.

Bî vê miqala kîn, em dixwazin ev şayiya Kurdan derkeve ronahiyê. Bêşik divê jî her ali va û hin xurttir li ser vê babetê lêkolin bêñ çêkirin.

Bo agahdariyê pêwist e em bêjin ku, me jî xwe ra mintiqâ Qersê û Qerekilisê bingeh qebûl kîr. Jî ber ku li van mintiqeyan Kose Geli bî awaki fireh û dewlemend tê çêkirin û hêj ji li gundan ev edet tê parastin.

Bî tarixa kevn 24'ê meha Sîbatê, bî tarixa niha 9'ê meha Adarê şenahiya Kose Geli çêdibe. Hin berf li erdê heye, berê êvarê berf dicemide û qesa digre. Lî belê wek şevêñ zivistanan ewqas sar nine.

Xortêñ gund dî maleki da komi ser hev dîbin. Qîrar dîdin ku dî filan rojê da Kose Geli çêkin. Dî nav xwe da wezifan beş dikin. Wê ki bibe bûk, ki bibe Kose, ki bibe parsvan, mirtib û yên dîn. Heta şeva Kose Geli hemû kes kar û barêñ xwe temam dikin. Ev karêñ han xasima bî dizi têñ çêkirin. Xelk pê nizane gelo isal Kose Geli digere yan na. Her wise kes pê nizane ku wê lawêñ ki Kose Geli bîgerinîn.

Şeva ku wê Kose Geli bigere xelk pê dihesin. Jî bo ku zarokên biçük netîrsin, meriyêñ malê jî jinan ra dibêjin, "deri işev venekin, wê Kose Geli bigere bila zarok netîrsin. Baştır ew e ku hûn zarokan bikin xew". Hemû milet deriyêñ xwe hiske-hisik digrin. Bî rasti ji tırsan nine, jî ber ku dema Kose Geli tê ber deriyan divê deri bikute, li ber deri bî grûba xwe va bileyize û bireqise da ku deri lê vebe..

Piraniya xelkê li malan komi ser hev dîbin. Lî gundan diçine mala axa yan dewlemendeki. Diwana çêdikin. Bî hevra gale gal û laqirdiyan dikin. Bî kurti şeva xwe bî şahi derbas dikin.

Xortêñ ku tevi grûba Kose Geli nabîn, li kuçan jî bo temaşe û qesta revandina bûkê dicivin.

Jin ji hazırliya xwe dîbinin ku wexta Kose

Geli bê hin tiştan bîdine wan û wana razı bikin.

Qiz û bûk ji dî bin malan da dicivin. Di nav xwe da şahiyan çedikin û şevê bî ken û laqirdi derbas dikin. Lî ber penceran û de-riyan li refê Kose mëze dikin.

Ewana, hemû bî tevayı zivistana rizi diqewirinin û xêrhatinê li sala nû dikin. Lî gundê mezîn û li bajaran jî grûbeki zêdetir refen Kose Geli digerin.

Ev şenâhiya hanê heta derengi şevê dikşine. Heta refê Kose Geli jî nav xelkê dernekeve û neçe ciyê xwe, xelk jî hev belav nabin.

Niha em ê merivên ku dî nav grûbê da cih girtine, şikil û şemala wana, kîncen ku li xwe dikin jî we ra bidin nasin.

BÜK: Jî xorten çeleng tên hilbijartın. Nota bûkekê rasti, dêrê Kurdi li xwe dike, kofî dîdine serê wi, şarêngin li dora kofî dialinin. Dêrên wi paqîj û spehi ne. Xeli davêjin ser rûyê wi. Wek bûkên rasti bî terbiye û şermoke ye. Bi tu kesi ra qise nake, her li kîleka Kose digere û jî wi ve-naqete.

KOSE: Jî xorten bejinbilind û namîl fireh tê hilbijartın. Kîncen wi kevn û periti ne. Saqo yan cakêteki fireh li xwe dike. Di bin wan kîncen fireh da pine û potik li xwe dialine, ku wexta lêxin canê wi neêse. Jî postê nêriyan an jî gihayê kumek dide serê xwe. Ciye dev û çavan vekiriye. Kum heta qırıkê dirêj e. Du sturiyê (qiloç) wi ji henin. Simêl û rû jî pirçen nêriyan çedikin. Hin caran disa jî postê nêriyan post dîdine ser sing û namila wi. Jî çawen gihayê, lingan heta güzekê girêdidin. Carna li milan ji çaw girêdidin. Lî güzek, enîş û çokan zengilêngi büyük dielqin. Du şivên dirêj û kilomkoti dîdine destê wi. Carna li ser wan şivan zengil ji henin. Kose ji tu caran bî bûkê ra napeyiye. Her wek nêriyan "prûp, prûp" dike yan jî pîrqe pîrq dike û digere. Meriveki dexes e, nahêle kes bûkê biquncirine yan pê ra qise bike, hertim wi diparêze. Ew kesen ku bela xwe dî bûkê din, cezayen cûr bî cûr dide wan.

KAL (Serok) : Pirani jî rengê spi û gewr kînc li xwe dike. Rû û simêlên xwe bî arê cil û qerqaş dike. Pir kes nêzikê wi nabin. Xêni jî laqirdi û leyistikên Kose, hemû tiştên din ev kalê han idare dike. Jî ber ku rûspi ye, pir xeber nade. Dema jî malan diyari berev dike qise dike. Jî malê ra berereket û xweşî dixwaze, lê eger bî diyariyan qayil nebe lome, gazin û nifiran li xwediyê malê dike. Gopaleki dî dest da ye.

PARSVAN: Jî bo rûn û tiştên dinê, du

heb tûrik bî xwe ra digerine. Diyariya ew kom dike. Carna dî destê wi da şûjin an derzi hene ku, ki hindik tişt bîde derzi yan şûjinê tê radike yan jî bî wan, wi dîtûrsine ku zêde û tiştê baş jê bistine. Dî destê wi da ji şiv heye.

EREB: Bi teniyê rû û desten wi hemû reş dikin. Cilêñ periti û kevn li xwe dike. Gelek baş reqs dike, govendê digre û digerine.

MIRTIB: Meşk, bilûr, def, zirne yan jî el-bane lêdixin. Yek, du yan jî hin pîrtir di grûbê da dîkarin cih bigrin. Pirani miqamên listikên girani lêdixin, wek Laçi, Kofi, Heseno yelli yelli û hwd. Lî mintîqa Qersê ji "Lê Edlê" distirê, dî vi kilami da pirani qerf henin.

SERVAN: Jî sisê û pîrtir kesan pêk tê. Refê Kose Geli jî kesen din an jî jî grûbeke Kose Geli yê din diparêzin. Bi coyen situr û dirêj digerin, pirani jî merivên gir tên hilbijartın. Bi şivên destê xwe xelkê dîtûrsinin û jî wana tiştan distin. Dî destê şervanê pêşiyê da şiveki dirêj heye, carna jî bo ku grûb belav nebe û bî nizami bimeşe û bireqise, bî şiva destê xwe li aliyê cep û rastê û li piştê dixe.

Xêni jî wana grûbek ji bî xwe pêk tê, ku ewana ji li dor û beren wana (grûba esli) kom dibin. Dî desten wan da ji şiv henin û miqamê muzikên şivanan lêdixin û bî wana ra dileyiz. Lê grûba esli tu caran rê nade wan ku ew tevi wan bibin. Dî vê grûbê da jî 14 - 15 sali bigre heta 30 sali meriv dîkarin besdar bibin.

REWŞA GERİN Û LISTIKA KOSE GELİ

Pey xebatên neeskere yani nehini, grûb hazır dibe. Dî destê wana da berê çira hebûn, dî nav tenekan da kerme vê-dixistin, piştre lembê luks û yén din jî bo ronahiyê hatin bikaranin. Grûb derdikeve ber malê, def, zirne yan jî meşk û yén mayin ci hebe dest bî lêxistinê dikin. Grûb bî destê hev dîgrin û qaseki direqisin. Çawa me li jor ji got, bûk tu caran xeber nade, Kose ji qise nake lê tenê "prûp prûp" a wi ye. Tevi dengê muzikê dengê zengilan, dengê şervan û xelkê ku li dora wana kom bûne li wi gundi yan jî taxa bajêr belav dibe. Jî bo ku xelk baş pê bihese refê Kose Geli dî nav gund da digerin, xasima jî dî meydana gund da xêleki dileyiz.

Paşê dor bî dor dicin ber deriyen malan. Lî ber deri qasek direqisin, pişti reqsê deriyê kilitkiri dikutin da ku xwediyê malê

deri lı wan veke. Xelk, carna bı qesti deri dereng vedikin, wê çaxê grûba Kose Geli wîsa zor dide deriyan ku hindik dimine deri bışkên. Lı gora pîrbûna kesen di malê da dileyizîn, hin şanoyen bîçük nişan didin. Grûb li gor daxwaz û niyeta wê malê şanoyan nişan dide û wana jî ber xwe derdixe. Helbet girani lı ser namlî Kose û bûkê ye. Dema xelatê xwe distinin, jî wê malê derdikevin û diçin maleki din.

Lê yê xweş û dewlemendtr li mala ku xelk bı pirani lê kom bûne dibe. Ew mal ji, bı taybeti malê axa yan ji malê muxtara ne.

LI MALA AXA: Gelek insan lı malê kom dibin. Dîxwin, vedixwin, henek û laqirdiyân bı hev dikin. Qala Kose Gelîyên salen derbasbûyi dikin. Pesnê hev û listikvanen baş didin. Yek ji, behsa hatina Kose Geli û wê çi binine serê wan dikin. Xwediyye malê teminiyan li bermaliya xwe dike.

Dema refê Kose Geli tê ber deriyê mala giran, dest bı govendê dikin û jî malen din bêtir lı ber vê malê dileyizîn û direqisin. Xelkê ku lı dora wana dicivin dixwazin bûkê birevinin, jî ber vê yekê ji gelek teşqeleyen giran çedibin. Hin mîvan ji, lı mala kombûyi derdikevin seyra wana. Paşê grûb dikeve malê. Wê hingê dikevine destê hev û govendê dîgrin. Kose û Bûk dikevin destê hev û di orta govendê da dileyizîn. Lexzek paşê grûp disekine, tenê Kose û Bûk direqisin. Pişti reqsê Kose xeliya bûkê hildide ku lê bînihêre. Çaxa lê dînihêre jî xwe va diçe. Carna ji Kose ji Bûk dixeyide û jî xwe va diçe. Bûk ber xwe dikeve, li çoka xwe diçe û jî cimaetê alikari dixwaze. Dînihêre ku kes guh nadê, diçe li ser Kose ba berdide. Kose radibe. Lê eger ranebe vê carê Bûk, mîze dike ku Kose ranabe hin bı lez û bez jî temashevanan alikari dixwaze. Bı işaretet destan derzi dixwaze. Merivên grûbê ji, bı şivan xelkê ditîrsinin ku zûtir dezi bîdin Bûkê. Hin caran bı rasti ji lı xelkê dixin. Hemû xelk û refê Kose tevi vê şanoye dibin. Bı gotin, bı hereket an ji bı tehreki din her besdar dibin.

Pir wext derbas nabe xwediyye malê, bı israrên mîvanan û Bûkê gazi bermaliya xwe dike ku derziyeiki bine bide Bûkê. Beri xwestina xelkê, bermali derzi nayne, lê gava malxwê malê dixwaze diçe derzi yan şûjîneki tine dide Bûkê. Heta wi çaxi şervanen qeslê ji bı daran li gelek kesan dixin, çi axa çi gundi ji kutanê para xwe distinin.

Wexta derzi dikeve destê Bûkê, diçe di Kose da radike, Kose jî ci dipeke û radibe ser piyan. Dibe pîrqe pîrqa wi, bı şîva xwe li cimaetê diçe û xelata xwe dixwaze. Dor bı dor jî xelkê xelatê xwe distinin, axîriyê jî jî xwediyye malê xelatek baş distinin. Heta bı dilê xwe yan ji lı gor bîryara ku di nav xwe da danine jî xwediyye malê tiştek nestinin dernakevin derva. Xelatê ku didin wan ev in:

Rûn, şekir, ar, hiri, pere û yê mayin. Her kes û her mal lı gor taqeta xwe diyariya refê Kose Geli dide.

Bı vi awayi him grûb bı xwe dileyize, dibêje û dikene, him ji xelk dibêje û dikene û wext derbas dike. Xêrhatina sala nû dikin, bereketê dixwazin. Tunebûn û belengaziya sala çûyi û zivistana dîrêj birêdikin.

Her bı vi teheri lı taxan û malan dîgerin, xelatan berev dikin. Kêm mal dimine ku neçinê. Lı her deri û lı her mali cuda cuda dileyizîn û piyesen kurt nişan didin. Piyesen wan bı naverokên xwe nêziki hev in.

Dema ku tu malê çûndinê namine, berê xwe didin mala ku lê komi ser hev bûne. Xelatê xwe li hev parvedikin. Hinek hene ku ew şev xurek çedikin û dixwin. Heta serê sibê di nav xwe da xeber didin, dileyizîn û dikenin. Carna ji yê zede dişinin dikanan û difroşin, pere lı hev parvedikin.

Dî nav grûbê da piri caran hevalek xeliya Bûkê direvine, yê din didin dû wi da ku xeliya Bûkê jê bîstînin. Heta jê nestinin jê venagerin. Carna ji di navbera wan da bı rasti şer çedibe, ser û guhê hev di xwinê da dîhelin. Axîriyê yeqin xeliyê tinin didin Bûka hevalê xwe.

Eger bizanibin ku lı gundeki cinar, taxek an bajareki din Kose Geli çê nabe, diçin wan deran ji. Her usa lı wan deran ji xelatân kom dikin, dileyizîn û direqisin. Eger du grûben Kose Geli rasti hev bîn, talanê hevdu dibin, bı hev ra şer dikin. Carna ji li hev têñ û ew tişten ku berev kîrine le hev parvedikin. Yani pîrsa xwe bı aşiti hel dikin.

Gelê Kurd bı vi awayi ji, dijayetiya xwe li hember xîrabiya zivistanê, betali û tunebûnê eşkere dike. Lı aliyê din bı qerf û bı usûleke nîveskere, neqayiliya xwe li hember axa û zordestan nişan dide.

Bı hêviyeke baş lı sala nû dînihêre û hazırliya xwe jî bo kar û xebatê dike.


Sıbat 1990

"DABEŞKAREKİ" TIRK İSMAİL BEŞİKÇİ

İsmail Beşikçi, sosyolog û ronak-bireki Türk e. Ew wek kurdolog, ulmdar tê naskırın.

Beşikçi jî ber pirtûka xwe ya bî navê "Devletlerarası Sömürge Kurdistan" (Koloniya Nav Dewletan Kurdistan) jî 12'ê Adara 1990 vîrda li İstenbolê girti ye. Piştî girtina wi di derheqa du pirtûkên wi yên din da ji dawe hate vekirin, pirtûk hatin komkürin, xwendin û belavkirina wan hate qedexekirinê.

Beşikçi dî 18'ê Nisanê da derxistin ber dadgehê. Wi li ser pîrsa Kurdi, raman û ditmîn xwe bî bûyar parast. Dî parastina xwe da iddiayê sawci qebûl nekir û ideolojiya fermi (Kemalizm) mehkûm kîr. Dî 15'ê Gulanê da jî bo mehkema wi gelek hunermend, ronakbir, niviskar, nûnerên komelên aşitixwaz û mirovi, diplomatên biyani besdar bûn û piştgiriya Beşikçi kîrin. Ev yeka han çavê komita dadgehê tîrsand û jî ber vê yekê Beşikçi dernexistin dadgehê, mehkema wi avêtin 19'ê Heziranê. Dî 19'ê Heziranê da ji, gelek piştgirên Beşikçi lî ber derê dadgehê cîviyan. Polês êriş bir ser piştgirên Beşikçi û 30 kes girtin. Beşikçi, ev bûyerâ han protesto kîr û axaftina xwe weha domand: "Dewleta



Tîrk dî 10'ê Heziranê da lî gun-dê Çevrimli 27 jîn, mîr û zarok kuşt. Jî ber ku ew kesen kuştı "parêzkariya gund" (Korucu) qebûl nedekirin, hatin kuştın. Dewleta Türk ev rûreşıya han dîke ser PKK'ê. Rojnameyê Türk ji wek buroyê MİT'ê dixebeitin, rûreşıya dewletê vedîşérin. Ez, vê qetliama dewleta Türk û tewrê rojnameyê Türkî protesto dikim û ifade nadîm mehkema we."

Ew bî "sûcê dabeşkari" û propagandeya "qelskirina baweriya milî" tê dadkîrin.

Girtina Beşikçi ne cara yekem e. Ew jî sala 1970 vîrda pîr caran hate girtin û jî 10 salan zêtir emrê xwe di hepisxanan da derbas kîriye. Cara dawin dî 1987'an da ji hepsê derketibû. (Dî navbera salên 1981-87 da, 6 sal dî zindanê rejima faşist da derbas kîr.) Lî tu wexteki dijmîn nikarîbû mîjî û dilê wi dil bîke.

Bêşikçi, dî 1967'an da dî zaningehê da wek asistanê sosyolojiyê kar dikir. Dî wê demê da lî Kurdistanê gelek bûyer û aksiyonê diji hukumatê dihatin çekirin. Wan bûyeran bala wi ji kışand. Beşikçi, jî bo ku wan bûyeran binase, xwe nêziki gelê kurd û kadroyê siyasi kîr. Eleqa wi roj bî

roj xurt bû. Dî wê demê da pirtûkek bî navê "Doğu Mitinglerinin analizi" (Analiza Xwepêşandînên Rojhîlat) nivisi. Piştî ku dewleta Türk bî vê yekê hisiya, Bêşikçi lî ba polês û dewleta Türk bû merî-veki xeter û "dabeşkar". Ew jî universiteyê ha-te dûrxistin. Jî wê rojê heta niha lêden, girtûn û cezakîrûn bû xelatêni wi. Lî gor kar û xebatê wi rejima tîrk ji li ser wi çavnîri û zulma xwe zêde kîr. Wek ku ew jî dîde xuyakîrin, heta niha ji "sûcê" wi yek tişteki ye, "dabeşkar".

Lê kîrinêñ dewleta kolonyalist çavê wi netîrsand. Hepîsxane jî bo wi bû zanîngeh. Roj bî roj bir û baweriyêñ xwe, xebata xwe xurttîr û tekûztîr kîr. Nav û dengê wi jî sinorê Tîrkiyê derbasi cihanê bû. Wek Kurdnas, kurdog, ronakbir û ulmdar.

İsmail Beşikçi ew kes bû ku, tucar paxavê bî meqam û kariyarêñ saziyêñ fermi nekir, xwe jî wan dûr girt. Bî zanebûn lî cem ilm û rastiyê cihê xwe girt. Gelê Tîrk bî vi lawê xwe yê hêja İ. Beşikçi, serbîlind e. Lê pîr mixabin ku ew yek nimûne ye ku dî pirsa Kurdan da lî hember ideolojiya fermi radiweste û bê tîrs dîbêje "gelê Kurd neteweyeki ye û navê welatê wan ji Kurdistan e". Bî rasti ji, jî ali ronakbireki Tîrk bî karanina van peyvan gelek gûring e. Jî ber ku ev gotin beri her tişti kuştina ramana şovenizmê pêwist dîke..

Jî ber ku Beşikçi lî hember ideolojiya nijadperest, kîrinêñ dewleta Tîrk ên lî ser gelê Kurd mehkûm dîke û lê rexne digre, ew jî xezeb û tofana dîjmîn para xwe digre.

Ew lî ser pirsa Kurd çend sal e ku, bê tîrs û bê tawiz têkoşin dîde, qelema xwe bî baweri û bî camêri lî gor prensibên ilmi dixebeitine. Hemû cûre dek û dolavêñ serkarêñ Tîrk û ideolojiya wan ê fermi Kemalizm, nikare pêşî lî xebatêni wi bigre.

Girtûna İ. Beşikçi rewşa rejima Tîrkiyê ya siyasi ji dîde xuyakîrin.

Berdevkîn rejima faşist û xulamokêñ wê dîbêjin ku "iro lî Tîrkiyê demokrasi heye!" Bî van gotinan hin kesen kêmaqîl ji baweriyâ xwe tinin.

Ew çawa demokrasi ye ku rê û olaxan nade da ku ulmdarek lî ser geleki 15 milyon ditin û baweriyâ xwe bine ziman. Jî ber vê yekê bî dehan salêñ xwe di zindanan da derbas dîke.

Lê aşkera ye ku demokrasi ne mûz e. Ew jî wek hemû averû xwedi hin xisûsiyetan e û pêwist e ku bî hin endazan bêñ pivandinê.

Bî hin tiştên berbiçav merîv dikare demokrasiya Tîrkiyê çi ye çi nine bîde xuyakîrin.

Îro karker û xebatkarêñ Tîrk û Kurd lî gor daxwazêñ xwe nikarin sendikayan ava bikin û jî bo mafêñ xwe yêñ çini bitêkoşin.

Partiyêñ ku bî navê karkeran û gundiyêñ xîzan bang dikin, nikarin xwe aşkera bikin û azad bixebeitin.

Gelê Kurd nikare bî zimanê xwe kovar û rojnameyan derxe, parti û rêxistinêñ xwe yêñ Kurdi çêke û azad bixebeitê.

Jî bli vana ji dewleta Tîrk di 9'ê Nisan 1990 i da bî navê "Biryarnameya 413" zagonek derxist. Bî vê zagonê lî Kurdistanê rewş dijwartîr kîr. Tero-ra dewletê ya lî ser gelê Kurd bî vê zagonê hate aşkerakîrin û ferzkîrin.

Qırkırin û nefikirîna gelê Kurd, girtûna bî hezaran pêşverû û welatparêz, ronakbireñ wek Beşikçi, sansûra gîran a lî ser weşanêñ pêşverû xisûsiyeta demokrasiya Tîrkan a derewin û sosret e.

Behremîn İ. Beşikçi yêñ ku heta niha hatine weşandînev in:

1. *Doğu Mitinglerinin Analizi*, 1967
2. *Doğu Anadoluda Göçeve Kurt Aşiretlerinde Toplumsal Değişme*.
3. *Doğuda Değişik ve Yapısal Sorunlar*.
4. *Doğu Anadolunun Düzeni*, 1969
5. *Bilim Yöntemi*, 1979
6. *Kürtlerin Mecburi İskanı*, 1977
7. *Türk Tarih Tezi, Güneş Dil Teorisi ve Kurt Sorunu*, 1978
8. *Cumhuriyet Halk Fırkasının Tüzüğü*
9. *Kurt Sorunu*, 1978
10. *Devletlerarası Sömürge Kürdistan*
11. *Bilim Resmi İdeoloji Devlet Demokrasi ve Kurt Sorunu*
12. *Bir Aydın Bir Örgüt ve Kurt Sorunu*

MUNZUR

SERHILDANA AGRI

(1926 - 1930)

DILSOZ

Piştî şikandına Serhildana Şêx SEID, dî navbera salên 1925 û 1928'an da dewleta Türk barbaryeke nediti lî dara xist. Bî sedan insanên welatparêz hatin dardakîrin, çi aşkera çi ji bî dek û dolav bî hezaran Kurd hatin kuştan û ji niv milyoni zêdetir Kurd ji hatin nefikirin. Ji vê barbaryê ne tenê Kurdêñ welatparêz, her wîsa eşirênu ku heta wê demê hevalbendiya dewleta Türk kırıbûn, ronakbir, serbazên Kurd, xwendevan û xelk bî xwe para xwe girtin. Li Kurdistanê bî ferma M. Kemal "mehkeme-yê İstiklalê" hatin sazkîrin û insanên welatparêz lî ber çavê xelkê hatin xeniqandin. İnsanêne me bî komiti dî xaniyan da hatin şewitandin, gund hatin kambaxkîrin û hwd. Dî derheqa ho-vitiya dewleta Türk da, dî pürtûka Garo Sosûni da minekeke weha tê dayin: "Em ji bo viya minakeki bîdin. Ev bûyera han ji ali çavnêreki, gava ku ji Diyarbekir derbas bûye hatiye nivisandin.

Li gor vi çavnêri ji Farqinê (Siliva) û der û dora wi 468 girti derdixin rê, ji vana tenê 250 kes bî saxiti dîgihije nawenda qezayê û dema ku eyni komîk dîgihije Diyarbekir hejmara wan dîkeve 134'an. Ji wê derê berê wan didin Xarpûtê, piştî çend rojan dî rê da, çavnêre ku li jor behsa wi tê kûrin (ku ew bî xwe ji girti bû) li devera Deve Boynû rasti vê komîkê tê û dibine ku ji 134 girtiyan 52 kes mane, û ji vana ji tenê 25 kes dîgihije şabûna derketina dadgeha awerte ya Xarpûtê!"

Her weha berxwedan û serhildana Agri, dî dema nefikirina sedhezaran Kurd da, dî dema kuştan û talanê da dest pê kîr. Kurdêñ ku wê bihatana nefikirin, ên ku ferma ji bo girtin û kuştuna wan hebûn û cih bî cih ji Kurdêñ ku li

nefiyê bûn xwe davêtun çiyayê Agri û dî berxwe dîdan. Sal 1926 û çiyayê Agri ji bin va dikeliya da ku agirê xwe bireşine ser dijmin.

SERHILDANA AGRİ DEST PÊ DIKE


Dî sala 1926'an da gelck Kurd ji ber zulma dewleta Türk xwe dabûn ali û xwe li çiyayê Agri girtibûn. Dewleta dagîker ji bo nefikirina gelek eşir û kesen sereke biryar stendibû û ji van kesan yek jê ji, serokeşirê Celâliyan Bro Heski Telli bû.

Rojek bî çika şefaqê ra eskerên Türk dîgrin ser gundê Tiflikê da ku Bro Heski Telli û malbatâ wi nefi bikin. Bro ne li mala xwe yê gund e. Ew li Bazidê dikandari dîke. Xebera reş dîgihije Bro. Bro Heski Telli şaş û metal dimine, ji ber ku heta wê hingê dostê dewletê bû û dî serhildana Şêx Seid da ji bî dewleta Türk va girêdayi mabû. Lê zû têdîgihije ku, dewleta Türk hemû kurdan dijmin dîhesibine. Ew bî xwe derheqa dostaniya xwe û dewletê da weha dibêje:

"Min bî dewleta Tîriyê zor xizmetên mezin kîrine, iro ji dikandari dikim. Bi hiç kesi karîm (karê min) nine, ez dostê dewlet im, ewê ji bo çi min derinin".

"Xwedêyo, tu dizani min tu xerabi bî dewletê re nekiriye. Ez dî nav şarê Bazidê de me, ewana çûne gund li min digerin. Ev ji lutfa te ye, tu tifinga min bî destê min bigihine, idi herçi irada te ye, li ser çavê min...." ("Biraninê İhsan Nûri Paşa", Hêvi, hejmar 2)

Her weha Bro Heski Telli gund vala dîke û berbi çiyayê Agri hildikîşin. Çıriskê serhildana Agri bî vê bûyerê dest pê dîke. Dewleta Türk



Serokê Serhildana Agri, Ihsan Nûri Paşa û jîna wi Yaşar Xanım (Wêne: Jî Hêvi, hej: 5)

qasidan dışine ba Bro Heski da ku wi bî dek û dolav bixapinin. Dî gundê Hêlac da dî navbera serbazê Türk û Bro Heski Tellî da hevditîneki çê dibe. Dî hevditînê da serbazê Türk bî riya tercuman ev daxwaziya han jî Bro dike: "Em û hûn misilman in. Te mirovên xwe kêşaye çiya, dîşini dîzi dikin, malê misilmanan tinin. Eva guneheki mezin e. Werin iteata dewlettê bikin, li nav gundê xwe, li gel jîn û zaroyên xwe asûde bijin." Bro dî bersiva xwe da bêbexti û bêedaletiya dewleta Türk dîde xuyan, zulm, dîzi û talankerîya wan lî rûyê wan dixe û nayê xapandin.

Hema pişti vê hevditînê dewleta Türk ordige-ha xwe dî quntara çiyayê Agri da vedigire û bî top û tıvingan êriş dibe ser hêzên welatperwer. Pişti şereke dijwar, tevi ku hejmara şervanên Kurd gelek kêm bûne ji, dijmin top û tıvingen xwe dî cih da dihêle û direve. Dî vi şeri da gelek eskerên Türk têñ dilkirin, gelek top, tıving û cebîlxane dîkeve destê şervanên Kurd. Rê-vebirê Serhildana Agri Bro Heski Tellî, dî vi şeri da bîrindar dibe. Lî dî vi şerê pêşin ê

Serhildana Agri da mîrxasiyeke mezin tê nişandan û êrişâ dijmin tê pûçkirin. Encama vi şeri jî ali Kurmay Albay Reşat Hallî va weha tê rawekirin: "*Valitiya Bazidê, jî bo serokê raperinvanan Bro Heski Tellî; jî bo teslimbûna raperinvanen Çiyayê Agri nameyeke dînivise da ku bereday xwin nerije. Tevi ku serokê raperinvan (B.H.Tellî) xember dîşine ku alay xwe bîşîne Bazidê û jêra sê roj muhlet bête dayin ku tevi hevalbendên xwe teslim bîbe, qumandarê Alayê jî bo vê nameyê, bersiv dide ku wê sîbê êriş bikin. Ev rewş, tevi ku jî bo şer mecbûriyet peyda dike ji, dîbe sedemê ku raperinvan bi xwinriji di ber xwe didin û dî dawiyê da alayê perişan dikin.*" ("Türkiye Cumhuriyetinde Ayaklanmalar", Kurmay Albay Reşat Hallî, Genel Kurmay Harp Tarihi Başkanlığı yayınları, Seri No: 8, rûp: 169)

Ihsan Nûri Paşa dî biranînê xwe da encam û rewşa şerê ewîl û pêşmergeyêñ Kurd weha şirovedike: "*Pasevanen (parêzkarêñ) Agri cara ewel daxa çavê bî Türkâ didan. Topan*

ku ji destê neyar girtibûn, nezanibûn çawa bixebeitinîn, şarezayê wan nebûn, topê bi ci hiştin. Ewi, yeki para mezin ji bo çiyayê Agri hesibandin. Fermandarê Turk ji bo ev areqeyê şermê, ev şikesta mezin hindik sar bîke, bi alikariya rûniştevanen rojavayê Agri, ku li bin ferma na wan bûn, bi şevê ciyê veşartina topê peyda kîr, çend ker û çend reşemal û topê, ku bi xaye bû, bir. Mêren Bro dereng bi ev reşediziya wan xeberdar bûn, pey ketin lê kelk negirtin. Şerê germ di nav wan da neqewimi."

Bî kurti Serhildana Agri, dî bin serokatiya Bro Heski Telli da heta dawiya sala 1926'an bî serbilindi tê domandin û gelek êrişen dijmîn tênikandin.

İHSAN NÜRİ PAŞA TÊ AGRI

Wek tê zanin berya êlankırına Komara Tîriyê, M.Kemal û hevalên wi soz û bext dabûn da ku Kurd bigihîjin heqen xwe yên netewi. Pişti êlankırına Komara Tîriyê, Kurd li benda bikaranina mafen xwe yên netewi bûn. Lî hêj bî ser Komara Tîriyê ra salek derbas nebûbû, M.Kemal û rîvebirîn Komara Tîriyê dest bî inkariya gelê kurd kîrin. Ev inkari, dî nav gelê Kurd da, dî nav serokeşir, ronakbir, xwendavan, serbazên Kurd ên ku dî ordiya Türk da bûn hêrs û kineke aşnebûyi peyda kîr. Û ev hêrs û kin di 1924'an da, lî hêla Çolemergê teqîya. İhsan Nûri (ku heta wê demê bî rutbeya Yüzbaşityê dî ordiya tîrk da wezife dikir) tevi çar hevalên xwe yên zabit ên welatperwer (Rami Rasim, Tewfiq Xurşid, Ali Rîza Beg) seri hîldidin. Lî gor agahdariya İhsan Nûri, wê dîmê dî bin serokatiya Xalid Begê Cibrani da lî Erzuromê Komiteya Serbixweyi ya Kurdistan hatîbû çekirin û İhsan Nûri bixwe ji gîredayı vê komitê bû. Serhildana İhsan Nûri û hevalên wi pişti şereke dîjwar tê şikestin. Pişti şikestina serhildanê İhsan Nûri, Rasim û Tewfiq Xurşid derbasi Sûriyê dîbin.

Serhildana Agri dî nava demeki kurt da, dî nav gelê Kurd da hêviya serxwebûna Kurdistanê cardin xurt dîke û ev hêvi xwe dîghîne İhsan Nûri û welatperweren Kurd ên dervayi welat ji.

Wê demê İhsan Nûri, Rami Rasim û Tewfiq Xurşid lî Iraqê bûne. Ew ji Iraqê direvin û dîxwazin bî ser Iranê ra xwe bigihînin Agriyê. Dî nav erdê Iranê da dî navbera eskeren Iranê û wan da şer dîqewime. Rami Rasim dî şer da şehid dîkeve, Tewfiq Xurşid mecbûr dîbe û cardin vedigere Iraqê, lê İhsan Nûri tenê bî serê xwe pişti gelek dîjhariyan xwe dîghîne ciyayê Agriyê.

Bî hatîna İhsan Nûri, Serhildana Agri bî awayekî rîxistini û eskeri kete serûberiyekê tekûz. İhsan Nûri dî nava demeki kurt da bî mîrxasi, bî rîvebirîya jîriti û çalakiya xwe bû serokê serhildanê.

DAMEZRANDINA XOYBÛN

Pişti şikestina Serhildana Şêx Seid gelek welatperweren naskiri derbasi derbasi Sûriyê, Iraqê, Lubnanê û Mîsirê bûbûn, xebatên xwe yên hêja lî wan deran dîdomandin. Her çiqas Serhildana Şêx Seid hatîbû şikandin ji, lî gellek minteqeyen Kurdistanê berxwedan dom dikir û hejmara grûbêñ çekdar roj bî roj zêdetir dibû. Bîguman zulm û zordari, nesî û kuştinênu ku ji ali dewleta dagîrker va dîhate kîrin, sedemeke gîring bû ji bo zêdebûna grûbêñ çekdar. Wek minak, lî ciyayê Çebeççûrê (Bingol) dî bin serokatiya Emerê Faro û Yado, lî Farqinê Şêx Fexredin, Lî Sasonê Eli Yûnis, Lî Agriyê Bro Heski Têlli, Ferzendeyê serokesirê Hesenan, Nadoyê Azizani, serokesirê Heyderan Nadîr û Mamo û gelek grûbêñ hûr û gir bî mîrxasi şer dikirin.

Lî hundir û dervayi welat dî nav welatparêzan da xebat û daxwaziya çekirina kongreyekî û rîvebirîneki nawendi roj bî roj xurt dibû. Mebest ji vê kongrê ew bû ku, yekitiyekî netewi bête avakîrin û ev sazi rîvebirîya şerê çekdari ya Kurdistanê bîke, rîxistinê Kurdistanî û welatparêzan lî hev bîcivine.

Dî sala 1927'an da çar rîxistinê Kurdistanî dîghîjin hev û bî navê XOYBÛN yekitiyekî netewi çedîkin. XOYBÛN bî yekitiya Kome-la Pêşketîna Kurdan (Kürt Teali Cemîyeti), Komela Cîvaki a Rêzkirîna Kurdan (Kürt Teşkilatı İctimaiye Cemîyeti), Partiya Gel a Kurd (Kürt Millet Fînkası), Yekî-

tiya Netewi ya Kurd (Kürt Ulusal Birliği) hate sazkırın. (Binérin, "Kurdistan'ın Sömürgeleştirilmesi ve Kürt Ulusal Hareketleri", Kemal Burkay)

XOYBÛN kongreya xwe ya yekem di meha Tebaxa 1927'an da, Lı Lubnanê li nawenda Bihamdûnê çêdike û di dawiya kongrê da du belavok amade dîke. Yek ji van belavokan ji Enternasyonala Sosyalist ra, yê din ji ji bala giştî ra tê amadekirin û belavkîrin. Di belavoka giştî da çend nuqteyên ku armanca XOYBÛN'ê dide xuyakîrin weha ne:

"1- Kongreya Yekem a Kurdan, rewşa dijwar a Kurdan, ku di bin despotiya rejîma barbar a Türk da ne, qirkirinê ku bi firehi tên çespandin û daxwaziya jiyaneke azad û serbixwe ya netewaya Kurd dide berçavan, û her weha li Kurdistana Türkiyê bi armanca sazkırına dewleteki serbixwe bîryar dide.

2- Kongre, di nava Iraqê da ji bo peydakîrinâ xudmuxtariya Kurdan a mintiqeyi, li gor daxaziya ku ji ali Koma Milletan va hatiye amadekirin ji hukumetên Ingiliz û Iraq piştgîriyê hêvi dîke.

3- Kongre, ji bo qebûlkîrinâ penaberên Kurd, ên ku ji ber zulm û zordariya Türkiyê mecbûri koçkîrinê bûne, spas dîke.

....." (Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni-Kürt İlişkileri, Garo Sasuni, rûp: 184)

Di kongreya XOYBÛN'ê da bî Ermeniyan ra ji protokolek tê hazirkîrin. Û li gor vê protokolê divê Kurd û Ermeni bî hevra li dîj dewleta Türk şer bikin, Ermeni dev ji porpagandayê nebaş ên li dîj Kurdan berdin û piştgîriyê bikin. Ligel vana XOYBÛN ji, ji bo mafêni Ermeniyan garanti dîde.

Damezrandına XOYBÛN'ê şayıyeke mezîn di nav welat da peyda kîr, di nava demeki kurt da bî komên çekdar ra pêwendî hate danin û ji bo amadekirina şereki giştî li seranseri Kurdistan xebateke hêja hate kîrin. Yek bî yek bî serok-eşiran ra pêwendî hat danin, ji bo çareserkirina nakokiyê navbera eşiran çalakiyê hêja hatin kîrin. Heta ji bo pêwendî û endametiyê, XOYBÛN'ê, "Sondeke Bîratiyê" ji amade kîribû.

"Sonda Bîratiyê

Ji tarixa ku ez imze davêjim şunda, di nava du salan da, eger ji bo hebûna netewaya Kurd û parêziya wê xetereki tehdidkar dernekeve meydanê û eger li hember Kurdêñ ku jiyana min, şerefa min yan ji şerefa xwe diparêze, malbata xwe û Kurdiyê diparêze (ku li hember wan wezife û berpirsiyariya min heye) ji ali Kurdeki din êrişek neyê kîrin, li ser ola xwe, şeref û heyiyêñ xwe yên piroz sond dixwim ku ez li hember tu Kurdeki dest navêjim çek, çareserkirina dawêñ xwinê û nakokiyêñ din heta du salan paşda davêjim, ez ê ji bo pêsigirtina nakokiyêñ şexsi û xwinrijandina navbera du Kurdan bi hemû geweta bicehdinim. Welleh, Billeh ê ku vê sondê xera bike dijmînê netewaya Kurd e û xayin e, cezayê xayneki mirin e." (Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni Kurt İlişkileri, Garo Sasuni, rûp: 186)

Ji bli vana bî bîryara XOYBÛN'ê, İhsan Nûri Paşa di Serhildana Agriyê da dibe serok û berpirsiyarê eskeri, Bro Heski Têlli ji dibe berpirsiyarê siyasi û idari. Ala Kurdistanê tê çêkîrin û bermameyeki ji bo rêvebiriya kar û xebatê Agri tê hazirkîrin.

QANÛNA LÊBORİNÊ Û SİYASETA KLASİK

Ji sala 1926 heta 1927'an gelek êrişen dewleta Türk hatin şikandin, ji ordiya tîrk bî hezaran esker hatin kuştin û bî sedan hatin dilkîrin. Her wisa 12 top, 36 mitralyoz, cebîlxane, heywanen bar û erekben eskeri ketin destê şervanen Kurd.

Dewleta xwinrij êdi baş têdigihişt ku, li hember wan hêzeke xurt, organizekri, şervan heye û fetisandina serhildanê ne hêsan e. Wê hingê dek û dolavêñ klasik ên bav û kalêñ xwe yê Osmani cardin derxistin meydanê. Di navbera eşîren Kurd da nakokian derxistin û wana beri hev dan, bî mal, mulk, pere û kariyerêñ bîlind li xapandina wan geriyan, propagandeya "biratiya islami" li dara xistin, tevgera netewi ya Kurdan wek kışkırina Ingiliz û Ermeniyan nişan dan û hwd. Lı aliyê din ji bî Iran, Yekitiya Sovyet, Ingiliz û Fransızan ra kar û barêñ diplomatik xurt kîrin. Lı pêşberi dînyayê, Türkiyê wek weliteke "aşiti" û "demokrasiyê"

dîdan nişandan û lı alikariya abori û eskeri dîgeriyan ku, ji bo stendîna vê alikariyê dî 1927'an da "Qanûna Tecil"ê (Qanûna Lêborinê) ango efûyeke sexte êlan kîrin.

Wek me li jor ji got, li Agri hukumeta Kurdan hatîbû êlankırın, ji bo kar û barêñ idarî, siyasi, eskeri, perwerdegari û hwd. gelek çalakiyên hêja hatibûn bi cih anin. Navê hukumeta Kurd û qehremaniya şervanê Serhildana Agri roj bi roj li Kurdistanê xurt dibû, gel hêdi hêdi tûrsa dewleta dagırker ji ser xwe davêt (eger meriv barbariya dewleta Türk a piştî Serhildana Şêx Seid bide ber çavan, sedemê tûrs û xofa gel baştûr tê famkîrin) û baweriyê bi xwe dîani. Ev rewşa han tûrs û xofeke mezîn dîkir dîlê dewleta dagırker û ji ber vê yekê ji, dî sala 1927'an da bi navê "Qanûna Tecilê" "efûyeki" hate êlankırın.

Berya ku meriv armanca vê efûyê bide xuyan, dîvî meriv bêje ku dewleta Türk ketübû tengasiyeke mezîn û rewşeye dijwar. Lî hember mîrxasiya gelê Kurd, bi qeweta xwe nîkaribû tuşteki bîke, ji ber ku gelek êrişen wi pûç derketin û serda ji xîsarên mezîn dit. Ica "Qanûna Tecilê" manewrayeki siyasi bû û ji xapandinê pêştûr tuştek nin bû.

Bêguman armanca vê "efû" ya sexte li aliyekî bi destxistîna welatperweren dervayî welat, xapandîna eşiran, bi destxistîna Kurden raperinvan û bi taybeti ji serok û pêşengên serhildanê bû; li aliyê dîn ji, efû, ji bo sempatiya dewletîn Ewrûpayê dîhate bî karanin da ku ji wan alikariyê bistinîn. Bi vê siyasetê ra ev serhildana neteweyi wek bûyereke zabîtayî dîhat nişandan û ji bo tecritkîrinâ serhildanê hemû rê û dîrb dîhatin xitîmandin.

Bî êlankırına "efûyê" ra dewleta dagırker, bangi welatperweren Kurd dîkir da ku ew xwe teslim bikin, herin ser kar û barê xwe, herin ser milkêñ xwe û "azadane" bijin. "Soz û bext" dîdan ku wê dewlet dest nede wan, alikariya wan bike û ihtiyaciye wan bi cih bine. Ü bi taybeti ji ji bo teslimgirtina İhsan Nûri paşa hezar fen û ger dîgerandîn, ji bo hevditînê qasîdan dişandin ba wi. Lê İhsan Nûri dek û dolavêñ dewleta Türk baş nas dîkir û dizanibû ku dewleta dagırker ketiye tengasiyê, dîxwaze serhildanê pasifize bîke û ji bo militarizekîrinâ

deveren serhildanê hînek wext bi dest xe.

Dî İlona 1928'an da di navbera nûneren dewleta Türk û İhsan Nûri Paşa da hevditînek çêbû. İhsan Nûri bi tedbir diçe hevditînê û tu car baweriyê bi dewleta Türk nayne.

Ev hevditun ji ali İhsan Nûri va weha tê rawekirin:

"Pêşniyarê nûneren bêrîtiyê ev bûn:

1- Arambâna Agri.

2- Destparastin (destkîşandin) ji pela-mardana (êrişkîrina) riya û xirabikîrin.

3- Şûndadayini pezê taciran.

4- Ji hemû zêdetur, derketina İhsan Nûri ji Agri bi her şertê ku ew bi xwe bixwaze.

Lî miqabil da Araratian her xirabiye kîrine (her xirabiyeñ ku Araratian kîrine) tê bexşin, her yarmeti ku pêwist be ew ê dewlet bide, rehetiya wan temin bîke."

"Min hemû pêşneyarêñ wan red kir. Bi min gotin: Were niştimanê xwe, dewlet li her babetê ji bona selamet û rehetiya te qewl dide! Bi welami (bersiv) min got: Ez li nava niştimanê xwe me, ji we ihtiyacım nine; esasen bi qewlê dewleta we bawerîya min nine!"

Gotin: Tu kijan dewletê dixwazi, em memûriyet bidin, her meaşê xwe bigir û kar bîke!

Min got: Ez naxwazim ku navê dewleta we li ser min be.

Gotin min: Ha ji te ra pasaport bidin, her li ku dixwazi azadane here. Ew ê pasaportê ji te ra konsolosê Tirkîye li Tebrizê bi xwe bine, bide te.

Min bi welami got: Beyhûde zehmet nekêşin! Ez bi hiç ciyê naçim. Ez xulamê neteweyê Kurd im. Hûn heke rast dîbêjin, welama eva ala serbixwoya Kurd ku li ser ciyayê Agri li ber çavê dewletê va daçikandiye bidin." ("Biraninê İhsan Nûri Paşa, Hêvi, hejmar 2)

Wek ku di bersiva İhsan Nûri da ji tê xuyan, teklîfîn dewleta Türk nayê qebûlkîrin û bi "efûya" wan ji baweri nayê anin. Heta li ser vê efûya bi ger û sen, XOYBÛN, geleç belavok û agahdari belav dîke û di wan belavokan da armanca dewleta Türk baş aşkera dîke. (Minakê belavokêñ XOYBÛN'ê, di pirtûka Garo Sasûni da hene)

ŞERÊ PÊNC SALAN Û ENCAMÀ SERHILDANÊ

Lî hember dewleta tûrk hêzeke xurt û rêzkuri hebû. Plan û dezgeyên dewleta tûrk û Qanûna Tecilê êdi pere nedikir û gelê Kurd nedîhat xapandin. Bî vê têgîhiştinê dewleta Tûrk, jî aliki va jî bo pasivizekîrîna serhildanê kar dikir, bî serokên serhildanê ra dîket bazariyan û lî ali din jî dî navbera eşirêñ Kurd da tovêñ nakokiyê davêt, wana beri hev dîda, serhildanê wek kîşkîrîna Ingiliz, Rûs û Ermenîyan dîda nişandan, raperinvanan wek eşqîya û rîbir dîda nasin. Tevi van derew û iftirayêñ han, serbazê Tûrk Albay Reşat Hallî, ango niviskarê pirtûka "Tûrkiye Cumhuriyetinde Ayaklanmalar", armanca serhildanê weha nişan dide û itiraf dîke ku ev serhildan, serhildaneke netewi ye: "...hemâ bêje hemû ev serhildanêñ han di bin navê xudmuxtariya Kurd da bi propagandayêñ biyaniyan ji bo Tûrkiyê armanca derxistina sergêjayiyê ajotine." (Tûrkiye Cumhuriyetinde Ayaklanmalar, Albay Reşat Hallî, rûp: 168).

Dî navbera salêñ 1926-1930 da hemû êrişen dewleta xwinirij pûç derketin, plan û listikên wê pere nekîrin. Dî navbera van salan da dewleta Tûrk, bî Iran û Sovyetê ra têkiliyêñ xwe yên diplomatik xurt kîr û jî bo pelixandina serhildanê li alikariya wan geriya. Lî ali din jî, bî Ingiliz û Fransizan ra pêwendi dani.

Dewleta dagirkir tenê bî van minakêñ jorin jî qîma xwe nedîani. Ew, dixwest İhsan Nûri bîde kuştin û jî bo vê karê bî qîlêr Şêx Evdîlqadır hilbijart. Şêx Evdîlqadır, jî Kurdistana Iranê bû lê pêki wi jî li Kurdistana Tûrkiyê bû. Dewleta Tûrk, demeki dûr û dîrêj Şêx Evdîlqadır bî kar ani.

Plana kuştina İhsan Nûri, dî biranînêñ wi da weha tê xuyan:

"Wê zivistanê qumandarê Tûrk ji bona kuştina İhsan Nûri bî telaş ket, û vi kari bî Şêx Evdîlqadır ku hêj ji di itaeta wan da bû, spart. Şêx ji bona vi kari Davo, kurê mezînê Bro Heski Paşê zavayê xwe hilbijart; bêguman, ewan dizi ve kar dikirin." (Biranînê İhsan Nûri Paşa, Hêvi, hejmar 4)

Jî bli viya bî plan û dezgeyên dewleta dagirkir, dî navbera eşirêñ dora Agri da nakoki dîhate peydakîrin û jî bo vi kari ji Şêx dîhate bî kar anin. Beşek eşirêñ Şaki û Hesesori dî serhildana Agri da cihê xwe girtibûn. Şêx Evdîlqadır, jî bo berhevdana van herdu eşiran (bî destûra dewleta Tûrk) kar dikir. Bî kurti ne dî kuştina İhsan nûri da ne ji berhevdana van herdu eşiran da (bî saya xebata raperinvanan) planê dewleta Tûrk neçû seri. Dî dawiyê da dos-taniya navbera dewleta Tûrk û Şêx Evdîlqadır nema. Dewleta njadperest, jî bo girtuna Şêx gelek serê xwe êsand lê Şêx Evdîlqadır teslim nebû û lî çiyayê Tendurekê, dî navbera ordiya Tûrk û eşira Şêx da şereki giran qewimi.

Dî serê havina 1930 da dewleta Tûrk, dî navbera 60 - 100 hezar esker, tank, top û 100 balaşîrên bombebaranê li mîntîqa serhildanê cîvand. Dî 11'ê Heziranê da şerê heri giran dest pê kîr. Lî hember êriş ordiya Tûrk, dî bin qu-mandariya İhsan Nûri da hêzên Kurd xwe amadeyi şerê giran kîrin û dî 18'ê Heziranê da İhsan Nûri "Fermana Êrişê" belav kîr. "Fermana Êrişê" weha ye:

1- *Neyar 11 Juen (Heziran) 1930 êriş anîye ser Agri, Qabaq Tepe, li quncê bakûra rojavayê Agri dagir kiriye û bî ci bûye. Şes firokeyên neyar dî pelamarê (êrişê) da hevkari kîrine. Dî rojêñ 11 heta 18 Juen tenê firokeyên neyar li serê Agri difiriyan, bomb davêtin. Sê firoke ji aliyê hêzên Agri lê dan e (derb xwarine) û yek ji wan firokan li meydana frokeyi ya Bay-zidê ketiye xwarê, frokevan mîriye.*

2- *Desteyêñ (hêzên) gerok ên Agri êriş û pelamara xwe bî ser bîngayêñ neyar ku li dor û berê Agri da ne, dest pê dikin.*

Bî liqê naverasti ferman dane ku hêzên xwe bîşinin çiyayê Tendûrek, pêşîya karwanê bar û benê hateçûyêñ neyar bigirin. Qolordiyek tûrk ku bî mebesta êrişkîrîna ser Agri ji nivroyê Enadolê bî rê ketiye, ji ber helsoran û pêkbûna mezîn a me li malbendêñ nivro yên Süriye û Dersim û Xarpûte neqediyaye pêş da were.

3- *Hevirgeyê yekem ê pêkanîna HOYBÛN: bî alikariya Xwedayê mezîn, êrişê ser hêzên Tûrkiyê bike.*

A- *Qomandarê giştî yê jandarmeriya Agriyê Temir Axa, bî hêzên ku li bin de-stêñ wi datinîn li bervarê 3 juliye (Tir-*

meh) 1930, bı alikariya xêlê (eşira) xwe Şemkan ku li malbenda Qolpê rûdînên, êriş dide ser nawenda qezayê Qolpê, paş dagirkirina bajêr pêşmergeyan heyagirtina gundê Pernavot bêrepêş bishine.

B- Şeva 4 juliye qomandarê qorxan serheng Veli Beg ji eşirên Gizkan û Zilan hêz bigire, bı pelamarek nişkeva bajarê Ixdır dagir ke. Her di vê rojê de hêzên Agri êriş dibin ser postên neyar li dor û berên Agri.

4- Serokên eşirên ku li nav gundê Deren kom bûbûn, hêzên wan roja inê, 4 juiye, hêzên türk ên ku li navçeya wan hene rikêb kîn, idareya navçeyê bı dest bigrin, bı ev çesnê ku li xwarê dînîvisim bı kar binin.

A- Lîqê Erciş ji Gelyê Zilan yarmetiyyê digire, paşdamalina idareya hûkûmet bı aliyê Adilcewaz dice, pey dagirkirina vi bajêri xeta jor a Çiyayê Sipan digire, girêñ nivroyê Adilcewazê digire û bı aliyê Axlat û Tatwan û Çiyayê Nemrûd desteyê siwar dışine.

B- Serokê Gelyê Zilan: pey dilgirtin û bêçekkirina hêzên türk li malbenda xwe rojavayê Çiyayê Aladax bigire, bı aliyê Melazgirt desteyên siwari bı hêz bishine ji bo yarmetiya êla Hesenan rûyên Qerekosê û rûyên Melazgirt, Patnos, Ercişê bigire.

C- Eşairên Heyderi ku li malbenda Patnosê rûdînên û ji xêla Melazgirt wan ên ku tevi pêkbûna me ne; bajarê Patnosê dagir bikin, girêñ bakûr û rojavayê Sipanê bigirin, aliyên Çiyayê Nemrûd, Mûş û Kopê desteyên siwari bishinin, bixebitin hatecûyên neyan bizanî!

D- Lîqê bargiri: navena Bargiri û Emisê dagirke, rûyên ji aliyên Wan, Erciş û Seray têñ bibende!

E- Lîqê naverast bı yarmetiya xêlê Celali, Milan û li gel eşairên ku di Alega da rûdînên û tevi yekbûna min navenda Bayzid-Agri dagirt, sê sed çekdar bı çiyayê Tendürek şand ji bo ku hêzên din ên şerkarê Bargiri bı hêztir ke, ji bona tirsandına Wan û Serayê bixebite, ji aliyên Wan, Tarp, Seray, Başqale û Hekarê zanînê bı dest bine, xeber bide!

F- Lîqê Ercişê: çiqas dikare bı lîqê naverast yarmeti bide!

G- Reisê xêla Adaman Qaymaqam -iro

yarbay dîbêjin- Hezreti İbrahim Axa bı zûtürin kat li gel Eli Begê Mirza Axa û Resûl Begê Zili û serokên eşiretên Qotan û Hesesori gotûbêj bike li gel wan eşair, li ber varê 4 yuiye 1930 roja inê êriş bikin ser bajarê Diyadinê, rûya Qerekose-Bayzidê bı temami hildewşinîn, bı taybeti hêz û xebatêneyar li Qerekosê bı tevahi berewurd bikin, bı desthênanan çend û çûna li gel Hemid Beg Têbikoşin, rûya hateçûnê li neqeba Tahir bixin metîrsiyê!

H- Paş dagirkirina van ciyên ku min diyar kırine, lîqêni Erciş, Patnos û Gelyê Zilan beşa zor a hêzên xwe li pişta xeta Dutax-Melazgirdê, lîqê Bargirê tevahiya hêzên xwe li Emis-Norşatê kom bikin!

5- Şûna fermandegeha giştî lt Agri ye; paş diyarbûna wez'ê şer ji vê ciyê re xeber bidin! (Biraninê İhsan Nûri Paşa, Hêvi, hejmar 5)

Dî ferмана jorin da hazırî, taktik û mintiqeyên serhildanê baş têñ xuyan. Jî ber ku êrişen dijmin zêdetir li ser Agriyê bû û dor li Agriyê hatibû girtin, İhsan Nûri wek taktik ferman dide mintiqeyên jorin da ku şer li her ali bête xurtkirin û herwcha hêzên dijmin li çar ali bête bezandin û parçekirin.

Bı kurti ji 11'ê Heziranê heta 25'lonê (1930) gelek êrişen dijmin hatin şikandin û gelê Kurd bı qehremani şer kır. Dî şerê 5 salan da bı giştî 12 firokeyên dijmin hatin xistin, nêzi 2000 hezar eskeren dijmin hate dilkirin, disa bı hezaran esekerên türk hatin kuştin û birindar kırın, 60 mirlyoz û 24 top hate bı destxistin.

Dema ku şervanêne Kurd diketin tengasiyê, derbasi Agriyê Bîçûk dîbûn, xwe bı hêz dikirin û cardin êriş dikirin. Çiyayê Agriyê Bîçûk di nav erdê Iranê da bû. Dewleta Türk dixwest ku çarmedorê Agri bîke hesarê û êrişeki gîran serhildanê bîfetisine. Jî ber vê yekê ji, jî berê va bı Iranê ra li ser Agriyê Bîçûk ketubû bazarîyê. Dî dawiyê da Iran, rûyê xwe yê dijminahiyê nişan da û Agriyê Bîçûk da Tîrkiyê. Lî hember çiyayê Agriyê Bîçûk Tîrkiye ji, jî deşta Bazidê hînek erd da dewleta Iranê. Her weha li ser sinoran guhartun çêbû û manewrayê dewleta türk firehtir bû. Dewleta barbar bı tank, top, firoke û eskereki gîran dora çiyayê Agri girt û mîrxasên Kurd kîr hesarê. Pêşmergeyên Kurd bı rojan ti û birçi û bê

alikari dî ber xwe dan, şer kîrîn. Lî mixabîn awantaja coxrafi, serdestiya eskeri û balistik, alikariya İran û Sovyetê mecalâ raperinvanê Agriyê teng kîr, şansê biserketina Serhildana Agriyê gelek qels kîr. Em nabêjîn jî bîni rakîr, jî ber ku sedemên têkçûna Serhildana Agri ne tenê ev bûn. Bî taybeti alikariya eşirê kurd ên xayîn sedeki gîring e dî hemû serhildanê Kurdistanê da. Jî bli vana serhildan li seranseri Kurdistanê xwe nişan nedaye û dî mintiqeke lokal da maye. Lî ali din her çar dabeşkarê Kurdistanê alikari dane hev û dî pîrsa Kurdi da bî hev ra hereket kîrine. Sedemek dîn jî, bê-dengiya dînyayê ye li hember serhildanê gelê kurd. Qelsiya kar û barên rêxistîni (her çıqas Serhildana Agri ya heri bî hêztîr be jî) û siyasi jî dikevin nav sedemên têkçûna serhildanê.

Me li jorê got ku, çar aliyê Agri hatibû hesarkîrin. Mêrxasên Kurd dî bin tehdida tibûn, bîrcibûn, bombeyên fîrokeyan, gulleyên tank û topan û êrişen ordiyeki mezîn şereke dijwar kîrîn û dî dawiyê da İhsan Nûri û servanê Agri bî êrişike qehremani çembera dijmîn qelaştîn û derbasi İranê bûn.

KAR Ü XEBATÊN ÇIYAYÊ AGRÎ

Bî hatîna İhsan Nûri Paşa (1927), Serhildana Agri ne tenê dî warê eskeri da her wîsa bî karêni siyasi û cîvaki ji kete serûberiyekê.

Wek tê zanîn li çiyayê Agri, dî bin rîvebiriya Bro Heski Têlli û serqumandariya İhsan Nûri da hukumeta Kurdan hate êlankîrin û ala Kurdistanê hate çekandin. Bî navê "AGRÎ" rojnameyeke Kurdi hate weşandin û bî riya vê rojnameyê şiyarkîrin û agahdarkîrinâ gelê Kurd hate meşandin.

Bî telefonênu ku jî dijmîn hatibûn wergirtin, dî navbera hêzên pêşmergeyan da pêwendîyeke xurt hate danin. Mêrxasên Kurd li gor sistema eskeri rîk û pêk bûn. Jî bo esker û serbazên Kurd uniformên taybeti hatin çekirin. Jî bo hinkırına kar û barên eskeri, bî awayekî nizami pêşmergeyên Kurd hatin perwerdekirin.

Bî ferманa İhsan Nûri, hin Kurden welatpârêz xwe teslimê dewleta Türk dîkin da ku plan û taktikên dijmîn hin bikin, xwe bigîhinin nav

eşirênu ku besdari serhildanê nebûbûn an ji piştgirê dewleta turk bûn, wana şiyar bikin, teşkilatê XYOYBÛN'ê dî nav wan çêkin û wana bîşînin nav refen Serhildana Agri.

Digel van kar û xebatê han, İhsan Nûri bi navê "Hinbûnek Gîsti" fermaneke giştî li şervanê xwe belav kîribû. Ferma "Hinbûna Gîsti", bî awayekî vekiri rîk û pêkiya serhildanê weha nişan dide:

"1- Her beşek jî bona xwe qumandarek bîbjêre, navê wi bî min bînivise!"

"2- Lî her navçeyak de bîrêvebirina idari pêk bêt, nisbet bî hejmara têkoşeranê xwe, xoreki (xurek, xwarîn) pêk bine, jî wan ra bışine!"

"3- Çek û qorane û enbarêن xoreki û tişt û müştên eskeri û navsandoqêن pereyên hikûmat û eskeri ku bî dest têن, top û mitralyoz hemû li gel tişt û müştên ku bî wan re ne malê Hikûmeta Kurda ye; di vê babetê de memûrek helbijêrin, pêşıya talanê bigîrin, ev mal malê xelkê ye, kes navê desti lêde!"

"4- Zabit, esker û memûren turk ku bî xwe bîxwazin jî bona me kar bikin, li jêri çavdêri û agahdari de jî wan kelk bigîrin, navendêن bêtêl, telgraf û telefonê islah bikin û jî karbîdesten ku bî wan tê bawer kîrîn kelk bigîrin, tenê xetên ku li nav me û neyar de ne bîbîrrin!"

"Dîvê ku froke, frokexane û bêtêl li jêri çavdêri da bin, hêç kesi nehêlin nêzikê wan be!" ("Biraninê İhsan Nûri Paşa, Hêvi, hejmar: 5, rûp: 32-33)

ÇAVKANI

- 1- "Biraninê İhsan nûri Paşa", Hêvi, hejmar 2,3,4,5,6.
- 2- "Doza Kurdistan", Zinar Silopi.
- 3- "Kurdistan Tarihinde Dersim", Dr.Nûri Dersimi.
- 4- "Kurdistan'ın Sömürgeleştirilmesi ve Kürt Ulusal Hareketleri, Kemal Burkay.
- 5- "Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni-Kürt ilişkileri", Garo Sasuni.
- 6- "Kürtler", L. Rambout.
- 7- "Türkiye Cumhuriyetinde Ayaklanmalar", Albay Reşat Hallî.

PEYVÊN DÛHEV/2

Berevkar: VAZGAL

F

- Fal û falbêj
- Fen û fesal
- Fen û fût
- Fen û hile
- Feqir û fiqare
- Fere û fol
- Feryad û fixan
- Feqir û jar
- Ferq û cûdayî
- Fêl û ferec
- Fêl û fort
- Fêl û tele (telik)
- Férisz û fehlewan
- Filan û bêvan
- Fir û sehş
- Fireh û dewlemend
- Firtix û şirtix
- Fixan û nalin

G

- Ga û gavan
- Galte û gep
- Gavan û şivan
- Gazin û lome
- Gazi û hewar
- Gef û gur
- Gurm û gur
- Germ û nerm
- Geşt û seyran
- Gewre û giran
- Gezo û mezo
- Gêj û evter
- Gêj û lal
- Gift û go
- Gil û gemar
- Gili û gazin
- Giran û comerd
- Guran û dijwar
- Guran û xedar
- Girtin û berdan
- Gor û goristan

- Gor û mezel
- Govend û çepik
- Gul û çiçek
- Gul û gewher
- Gul û gulbend
- Gulav û enber
- Gulik û rêsi
- Gundî û cinar
- Gurz û gopal

H

- Hacet û hucet
- Hakim û emir
- Hal û hewal
- Har û din
- Har û hêç
- Hat û bat
- Hat û çû
- Hat(in) û hewar
- Hat û nehat
- Hazîr û amade
- Hazîr û bîzîr
- Hazîr û nazîr
- Hazîr û guhdar
- Hel û merc
- Helal û zelal
- Henek û laqîrdî
- Henek û qeşmeri
- Heq û hesab
- Heq û hîqûq
- Heq û rast
- Heq û qelend
- Heps û zindan
- Heval û hevkar
- Heval û hogîr
- Hewar û bang
- Hewar û gazi
- Hewar û helan
- Hevraz û berjêr
- Hewr û mij
- Heyf û mixabin
- Heyam û sal

- Heyran û heşmetkar
- Hêdi û emin
- Hêsir û girin
- Hêsir û pepûk
- Hêvi û evin
- Hêvi û daxwaz
- Hêvi û niyaz
- Hilgir û wergêr
- Hilgêr û dagêr
- Hilm û bûx
- Hilm û gulm
- Hisab û texmin
- Hisn û cemal
- His û aqîl
- Hisk û ter
- Hisk û tahl
- Hiç û pûç
- Hiva û avat
- Hiz û diz
- Hov û dewar
- Hov û dirinde
- Hol û holvan
- Hori û melek
- Huner û sen
- Hûr û gür
- Hûr û mûr

I

- Ilm û huner
- Isûl û qaide
- İnsaf û rehm
- İman û pir

J

- Jan û birq
- Jar û perişan
- Jar û zeyif
- Jêr û jor
- Jin û jinkok
- Jin û mal
- Jin û mîr
- Jin û mindal (zarok)

- Jin û jin
- Jir û aql
- Jir û camêr
- Jiyin û afîrandîn
- Jiyin û mîrin

K

- Kafîr û müsîlman
- Kal û bav
- Kal û pir
- Kani û av
- Kar û bar
- Kar û karxezal
- Kar û kasibi
- Kar û kîrin
- Kar û pêşe
- Kar û qezenc
- Karker û cotkar
- Kavîl û xopan
- Kaw û kubar
- Kel û bin
- Kel û mel (pel)
- Kelem û stîri
- Kelk û kar
- Ken û gîrin
- Ken û pîrqin
- Ker û bar
- Ker û bêdeng
- Ker û ga
- Ker û gêj
- Ker û lal
- Ker û kor
- Ker û têr
- Kerewiz û biber
- Kes û kar
- Keser û kovan
- Kesk û sor
- Kevir û kuçik
- Kevn û nû
- Kêf û henek
- Kêf menfeet
- Kêf û sohbet
- Kêf û şahi
- Kêf û dilan
- Kêm û zêde
- Kîl û kîldang
- Kîl û kîlçik
- Kilit û müste
- Kin û kurt
- Kit û zo
- Kuşt û kal
- Koç û bar
- Koç û koçbar

- Kok û reh
- Kor û seqet
- Koşk û sera
- Küçik û kevir
- Kuşki û rizi
- Kul û elem
- Kul û keser
- Kul û kovan
- Kulfet û eyal
- Kund û bûm
- Kur û kal
- Kurm û müşk
- Kurt û Kurmancı
- Kuşt û bir
- Kût û bayî

L

- Laf û fort
- Lal û dûr
- Lal û mîrcan
- Lat û pût
- Lehi û sêlav
- Leyl û leyelan
- Lez û bez
- Lîv û dev
- Liv û tevger
- Lod û lûs
- Lori û stran

M

- Maç û müç
- Maç û ramûsan
- Mal û can
- Mal û hal
- Mal û malbat
- Mal û milk
- Mal û pere
- Mal û rîzq
- Mal û xezine
- Man û neman
- Mang (hiv) û roj
- Mar û mîrû
- Mar û müşk
- Mat û melûl
- Mene û hacet
- Merd û merdane
- Mest û gêj
- Mezin û bilind
- Mezin û kevn (qedim)
- Mêl û xar
- Mêrg û çimen
- Mêrg û kani
- Mêş û keş

- Mêş û mîrû
- Miftî û qazi
- Mîj û dûman
- Mîj û xumam
- Mirî û zîndî
- Mih û berx
- Mir û dotmam
- Mir û hakîm
- Miratgîr û bîrabîr
- Mirovi û camêri
- Mori û mîrcan
- Mûr û mar

N

- Nal û bizmar
- Nal û nalbend
- Namûs û xiret
- Nan û av
- Nan û dew
- Nan û pêxwarîn
- Nan û pivaz
- Nan û zîk(o)
- Narin û şîrin
- Nas û nenas
- Nasîr û bîrin
- Nav û nas
- Nav û nişan
- Nav û nûçik (nitke)
- Naz (nazîk) û nazdar
- Naz û nazîk
- Naz û nûz
- Nedî û bîdi
- Nedit û dit
- Nerm û hîşk
- Nerm û zelal
- Nevi û neviçirk
- Neve û netice
- Nevs û çile
- Nav û dîl
- Newal û kendal
- Nexş û nîgar
- Nexwêş û serêş
- Ney û saz
- Nêr û mî
- Nêt û meram
- Nêt û metleb
- Nîmêj û roji
- Nivi û nîvçe
- Nûçe û gotar

(Berevok dom dîke)

"WELATÊ MIN DI DILÊ MIN DA YE"/ 4

Werger ji Swêdi: **DILSOZ**

(Diya Lena radyoya gift û go guhdari dîke, li eynê mêze dîke, xwe potra dîke, li xwe mêze dîke û zikê xwe dikşine hundır, pêra ji stran dibêje.)

LENA- (Tevi pirtûka dersê ya swêdiya bazarê dîkeve hundır û radyoyê digre.) Dayê, ji kerema xwe ra, tu dikari min ji bo axaftina cîvinê imtihan biki? Yan ji bavê min?

BAV- (Cilê boyaxê lê ye û wê sandalyayek boyax bike.) Wexte min tune. Tu nabini ku ez gelek mijûl im? (Boyaxê dîke û disitine?)

DAYIK- (Şareki li dora stuyê xwe dialine û di eynê da li xwe mêze dîke ka pê dîkeve yan na.) Ez dikarim ji heqê wi derêm?

LENA- Gelek hêsan e. Tenê xwendîna ew peyvên reşkiri ne. Wanal (İşaret dîke) û ez ê rawe bikim ka têr ci maneyi.

DAYIK- İmtihana te heye?

LENA- Herê. (Rûdînê. Pirtûkeki dibine.) Bak-si? Gelo ki vê pirtûkê dixweyine?

BAV- Ez. Tişteki wisa ye ku min iro ji dikana antikavan stend.

LENA- Lê wek ku tu ji dizani ew Kurd e. Te pê nizanibû.

BAV- Belê ez pê dizanım. Gelo ez ê bikaribim careki bî reheti boyaxê bikim, gelo wê vi halê min çawa be? (Lena dibîşire?)

DAYIK- Ka em bibinin. **Hilbijartın?** Ev ci ye?

BAV- Na. Ci rengeke xerab el Ki viya hilbijartiye?

DAYIK- Te. Û disa yê bî rîk tu bûyi.

BAV- Hm... Boyaxa me ya sor nemaye? Ez dicim û lê digerim.

LENA- **Ray dayin.**

DAYIK- Ci?

LENA- Hilbijartın tê mana ray dayinê.

DAYIK- Aha... Belê rast e, eynî wisa ye.

BAV- Delala min, te boyaxa sor ditiye?

DAYIK- Li binê dezgeya firakşoyê binihêre!

BAV- Na, li vê derê tenê... (Gurmini û şingini)

Bela Xwedê!

DAYIK- Te got ci?

BAV- (Tevi qutiyeki nû yê boyaxê tê hundır.) Li vê derê hûn dibinin ku ji bo her tiştî nizamek heye. (Bav kilama dibêje)

YVONNE- (Bî lez tê. Lî ser rûyê wê maskeyeke

kesk, dî navbera pêçiyên wê da liben pembû heye. Cilê sibehi lê ye.) Tu li ser boyaxen min büyi. Tu lê binihêre hele!

YVONNE- Of, Xwedêyo tu din i ci yi, bavol Ev maskeyeki ser çavan e.

BAV- Tu nîkari tişteki baştır bibini? Tu dikari hinekan pê bitîrsinî!

Xeyalên Boyaxkirinê

Wek lêxistina kemanê ye
Dema meriv sandalyayek boyax dîke,
Bî eynî ritim, bêdeng, bî xetên lêhati.
Jîyan gelek kurt e,
Jî hedê xwe zêtir zû dice û winda dibe.
Belki rojeki xweş ez dibim artist.

Meriv baweriya hunermendiya mezîn peyda
dike

Jî ber ku ew baştırin e.
Belê, ew hunermendiyeki mezîn şirovedike
Dema ku min paletê xwe kiri,
Hûn ê xwe li ciheki rast, rast bî cih bîkin.
Maqûlê Picasso û Salvador Dalîl

Bî motivan tiji ye
Jiyana min ê hebskiri
Ku wê ronahi û harmoni bide xuyan
Çend tûpêñ boyaxê
Paşê wê gol û çiya
Dî demeki kurt da derkevin holê.

Gava VanGogh rojê çekir
Ew zer bû wek sandalya min
Ew ji niha va dikare şahidiya serê bîke
lê gava hunermendeki din
Bî rengê deryayê xerik dibe
Ez radikim rengê kesk, jî ber ku wek huner-
mend meriv azad e.

Wek we bîhist ji strana min
Ew sinet e wisa dirêj,
Dema em wênevan dîmrin berhemên me
dimînin li dû me
Wê bî kok spehi bîbe belki
Uşşş, ez ji niha va westiyam

Ü diwana min şaheser e.

YVONNE- (Ax dıkşine) Na lo, xwediyê wi tu yi. (Bî şid radike pirtûka dersê ya diya xwe) Eşş..! (û davêje erdê)

LENA- Tê kijan pirtûki bistini?

YVONNE- Ew pirtûka ku min do ji dikandarê spehi kiri... Ew a ku ji bo maskeyê rûyan bû.

LENA- Ú me yê ji bo çi bistenda?

YVONNE- Ew winda ye. (Dest bi gîrînê dîke) Niha ez viya winda nakim. Ev wek çiya lê rûdînê. (Hinarokên rûyê xwe dîkşine û dîqîre) Ü ku min bawer dikir ú ez ê xweşik bibûma. Wi ji min ra got. Off.., niha édi qet tu kes ji min hez nake. Bavo, wê keça te édi neyê hezkîrin di seranseri jiyana xwe da.

BAV- Bi maske yan ji bê maske ez ji te hez dîkim, lê ez bê maske hîldibjérîm.

LENA- Ü ez li ber xwişka xwe ya bîçûk secede dîbim!

YVONNE- Bavo! (Dîce pêşberi wi û bî hîrs tê xuyan) Rake sandalyê!

BAV- Bo çi?

YVONNE- Min got, rake sandalyê! (Bav sandalyê radike ú Yvonne radike pirtûkeki ku bavê wê kiribû binê sandalyê. Pirtûkê li nava serê bavê xwe dixe. Bi qureti ú hîrseke bîneşik ji wê derê dîce.)

BAV- Çi bû pê?

LENA- Jê bipirsel Eger tu biwîri.

DÊ- Ha.., em li kêderê bûn? Sererastkirin?

BAV- Sererastkirin? Bes li kuderê? (Paşva dîce û h sandalyê dînihîre.) Qesda te wê derê ye?

LENA- Ax, bavo, tu li karê xwe mîze kel

BAV- Belê, ez ji bo wi dicehdinim, lê xelk tê vê derê ú ji min dîxwaze ku ez sandalyeyan ragîrim ú tekûz bikim. Bihêle da ku ez niha viya çêkim! (Gili ú gazinê xwe bi minc minê didomine)

DÊ- Rojev?

LENA- Belê, cûreyeki serecem e... (telefon lê dîkeve) Bersiv bide, dayê, ez ji di vê navberê da li ser peyvê bisekinim.

DÊ- Pelê ixlamûr... Eger wextê wi hebe ez ê jê pîrskim. Ji te ra ye.

BAV- Wextê min tune. Bi rasti ez dîxebeitim.

LENA- Telefon ji min ra ye, tu boyaxê bîke. Belê? Merhebal Çi? (Dê radyoyê vekîriye, distîrê û dans digre) Dayê, ez nabîhîzim. Kêm bîkel (Dê nabîhîze) Piçek bisekinel Dîvê ez radyoyê bigîrim. (Bi hîrs li diya xwe dînihîre ú radyoyê digre.) Bibexşîne, Ferhad, niha dengê te tê min. Çawa ye? Mm... Gere me işev hevdu bîdita? Belê... Em nikarin? Bo çi? Lî tu ji dizani ku me bîryar dabû... Ez ji xeberdana te ra ecêbmîyi dîminim! (Dê h serîya wê dîsekine ú guhdari dîke) Dayê, tu nikari deqekî xwe ji vê derê bîdi ali. (Dê dîlşkesti dîce) Ev ci ye, Ferhad? Bo çi em nikarin hevdu bîbinin? Herê... Na... Tişteki bûye, ez guhdariya te dîkim. Niha bîbêjel Herê.., herê... Christer? Eger ez bi wi ra bim? Lî tu ji dizani ku ez bi te ra me, Ferhad. Em ê hev in. Tu pê dizani.

DÊ- (Serê xwe dîke hundîr) Tu qchwîyekî dîxwazi, Lena? (Lena bi bîhîntengi diya tam dide.)

LENA- Wek ku tu ji dizani Christer hevalê min ê dersxanê ye. Ez jê hez nakim lê ji ber ku tenê min, wî hemêz kîriye... Na lo, li ba we wîsa ye... Ez dizanim, Ferhad, me berê ji gelek caran li serê xeber daye. Lî niha tu li vê derê yi. Niha tu li Swêd i û li vê derê em bi vi hawê dîkin. Tu

têgîhiştî! Em li vê derê hevalen kurin ji hemêz dîkin! Tu nikari erd û esman ji bo tişteki weha bîryarî. Na lo, ez nikarim.., û bîryara wi tê bîdi. Tê li ser tişteñ ku ez ê bikim û nekim bîryar bîdi. Na, tu nikari! Wê gavê ez ji bo xwe spas dîkîmlî (Bî hîrs telefonê davêje, di cihê xwe da rûdînê û bî balkêşî dînihîre. Telefon carek din lê dîkeve, lê Lena bersiv nade.)

DÊ- Çîma tu bersiv nadi?

LENA- (Dîgîri, radike saqoyê xwe û dîce dîrva. Ronahi bî dorê Ferhad û Lena nişan dide. Lena dîce û tê û kesirandi tê xuyan. Ferhad li ber telefonê rûniştiye û car bî car radike telefonê ku telefon bike, lê car din poşman dibe.) Bibexşînel

LENA- Bibexşînel

LENA- Çawa çend gotinê hîşk dîkare hemû tişteñ ku me afîrandibû xerabike? Gotinê zêde hîşk ku em di cih da poşman dibin, karê deqe-ki. Niha édi her tişt dîjwar tê xuyan, ku jiyan min ji dîqede. Ez bîriya te dîkim û min dîxwest ku em bi hev ra bûna. Neheqi û ehmeqi ye ku meriv li hember hev weha bîkel! Gere bî awayeki xwezayî û sade bîhata gotin: "Bibexşînel"

FERHAD- Gava me têkiliya xwe ji hev bîri, be-revajiyê wi çebû, bî her awayi şaş têgîhiştineki bû. Çi eşek çekir, me dilê hev pir şikand. Hemû şaşılı bûn. Hemû tişteñ bê mane û vala bûn. Ez bîriya te dîkim û dîxwazim ku em bi hev ra bin. Meriv çawa li hember hev dîkare weha neheqi û ehmeqi bîkel! Gere bî awayeki xwezayî û sade bîhata gotin: "Bibexşînel"

HERDU- Ez bîriya te dîkim...

VII

(Çend Kurd li qehwexaneki rûdînêni. Ferhad û Ahmed li qunceki rûniştiye.)

AHMED- Ferhad, ez di tehtîlê da li Stockholmê li ba Mehmed bûm. Ew gelek xebitiye û ceh-dandîye da ku ji bo te bi meriveki ra pêwendî deyne li jérê û wîsa tê xuyan ku wê çareser bîbe. (Ferhad wîsa tê xuyan ku, hisê wi li ciheki din e.) Ev ci ye, Ferhad? Ez hîvidar im ku tu poşman nebûyi?

FERHAD- Poşmani, na. Tişteñ ku ez mecbûr im bîkim, ez ê bîkim. Tu tişteki ku min ji bîryara min bide poşmankîrîn tune. Ne ew ji... (Xemgîn tê xuyan)

AHMED- Ez tê nagîhîjîm. (Dest davêje ser milen Ferhad) Lî ev şâhiya şexsi li ber doza mîleteki sıvîk tê. (Ferhad serê xwe dîke ber xwe)

BAV- (Bavê Lena dîkeve hundîr û çavê xwe li yeki dîgerine.) Ez li yeki dîgerim ku navê wi Ferhad e.

FERHAD- Ew ez im. (Radîbe piya)

BAV- Ez dîkarim bi te ra hînek xeberdim?

FERHAD- (Ecêbmîyi tê xuyan) Belê, fermo. (Ew rûdînêni)

BAV- Belê, ez... merhebal (Destê xwe dîrê Ferhad dîke) Navê min Bengt e. Ez bavê Lena me. (Ferhad li hal û demê wi dipirsel) Çêtîr ew e ku meriv raste rast bîkeve meselê. Hm... Belki tu dizani ez ji bo çi... lî bi vi hawê. Hm... Greta, aango jîna min, diya Lena, xwest ku ez... Na, bi rasti ez nîzânîm ez ê çawa bîbêjîm. Wîsa tê xuyan eger em...

FERHAD- Ez têdîgîhîjîm. Hûn naxwazîn ku Lena bi yeki bîyani ra hevalti bîke.

BAV- Na... hm... Qesda em ne tam ew e.

FERHAD- Niha ez û Lena ne bi hev ra ne. Her weha li gor daxwazîya dilê te bû. Ü belki bi vi hawê çêtîrin dibe... Aango rasti ew e ku ez ê ji vê derê herim. İhtiaciya min bi welatê min heye.

BAV- Ya... Lé wek ku tu ji zani, xeter e? Qesda min, bı qası ku ez dizanım tu penabereki siyasi ye.

FERHAD- Rast e, lê divê ez herim welat.

BAV- Tişteki dijwar e. Es bı xwe dı saziya Koma Miletan da büm. Lı wê derê ji tékoşineki mezin hebû. Baş e. (Radibe ser xwe) Divê menw ji bo baweriya xwe tékoşin bide. (Ji nişkava rûdinê) Haya Lena ji viya heye?

FERHAD- Na, min tişteki negotiye û ew naxwaze bı min ra xeberde.

BAV- Ne exlaqê wê ye ku wise dirêj bike.

(Nişkava koma beredayan dikeve hundır. Tev dengê xwe dibirin û bı çaveki balkêş dînihêrin.)

XORT 1- Meriv dikarıbü xwe teslim bıkira lawo! Nalet lê bê tu ciheki vala tune. (Rasti Kurdeki tê) Xwe bide ali, zebaniyê cehnemel (Kurd bı guman tê xuyan.) Xorten beredayi sandal-yeyan li vi ali wi ali tam didin. Kurd radibin ser xwe. Xorten beredayi bı tewreki bıçükdi rûdinê.

XORT 2- Çı ye, hûn li çi dînihêrin? We qet berê insanın neditiye? Swêdi, lawo! (Bı kulma li singê xwe dixe) SWËDÎ! Ew em in. Ü em in ku li vi welati rûdinê. (Bı tehditkari radibe ser xwe.) Lé çi heye ku ev welat hêdi hêdi li me teng dîbel (Kurdeki tam dide)

BAV- (Bı hêrs radibe ser xwe.) Na, édi bes e.

XORT 1- Tu xwe neke vi işi, kalê pis!

BAV- (Diqire) Bîteqzin ji vê derê herin! Meriv ji Swêditya xwe şerm dike.

XORT 1- Eh.., çi yani?

XORT 2- Tu li vi şeytanı binihêre yawo! Em tenê ji xwe ra rûdinê.

BAV- Lı vi ali şeytan li wi ali şeytan. Wê çaxê ez ji we ra pêşniyar dikim ku hûn herin û li ciheki din rûnén û ji xwe ra hin bîbin ku meriv çawa wek xelkê li cihê rûniştandinê di terbiya xwe da dimine.

XORT 1- Eh, hevalno, em xwe vedikisının. (Dertên derva)

BAV- (Serê xwe li vi wi ali dihejine) Evya pisitiyeke mezin e, xelk çawa dikare weha hereket bike.

AHMED- Belê, divê em ji her tişteki ra piçek sebir nişan din.

SİNO- Em hêdi hêdi hin dîbin.

BAV- (Bı kûrahi difikire) Min tu car bawer nedikir ku tişteñ weha cédibin. Em çawa dikarin? (Ji temâsevanan ra) Em çawa dikarin?

VIII

FERHAD- Merheba, Lena!

LENA- Merheba!

FERHAD- Divê ez bi te ra xeberdim. Ez gelek fikirim. Ez naxwazim ku bı vi awayi bibe, Lena. Min wê meselê bı ehmeqi hêjand, lê... belê gava min te li stuyê Christer pêçandi dit, ji min ra ecêb û tişteki ne durust hate xuyan.

LENA- Tu lê binihêre, wek ku tu ji dizani tenê ew hevalê min e.

FERHAD- Belê, ez dizanım... ez ji fam dikim.

LENA- Fam dikî?

FERHAD- Belê, ez fam dikim, lê ne ji bo her gav. Ez ji dizanım ku tu maneki xwe tune, lê...

YVONNE- (Wek ba ú bahoz dikeve hundır) Lena, tu büyi yê ku ji min plasterên pêçandinê deyn kîr? (Lı der û dora xwe dînihêre û Ferhad dibine) Wi li min kurê! Tu li vê derê yi! Hûn ji hev venegetiya bûn?

LENA- Yvonne! Min ji te rica nekir ku tu weri

hundır û min tişteñ neditiye. Bîteqzel!

YVONNE- Meriv li hember xwişa xwe ya bıçuka nazik tişte weha nabêje. Divê tu bıçiyayı qursa nezaketê, eger niha bıkaribe alikari bice. Biharê erzani heye, pênc car bı 300 kroni ye.. Belê nerx ev e. (Bı lêvan ramûsanek dide Ferhad) Oh, Xwedêyo, tu ci "şirin" i.

LENA- (Ji bo xweragirtinê dicehdiine) Xwişa min a delal piçek insan be û ji oda min derê here.

YVONNE- Eger ez ji vê derê herim hûn ê men bibexşin. Dilê min ji min ra dibê ku ez herim. (Bı dest û lêvan ramësanek dide Ferhad û xwe davêje der)

LENA- Meriv dikare zêde bı mijûli û rûtîş lê bigere.

FERHAD- Belê, hûn bı taybeti ne wek hev in.

LENA- Na, Xwedê neke!

FERHAD- Tu, Lena? (Desteki xwe datine ser Lena)

LENA- Belê?

FERHAD- Tu dikari li min bibori? Ez gelek ji te hez dikim. (Lena serê xwe dike ber xwe û wi bersing dike.) Lena, em nikarin di van demen dawi da hevdu zedetir bibinin?

LENA- Mebesta te bi demen dawi ci ye? Qesda te ci ye? (Ferhad bêdeng rûdinê) Ez dizanım... Ez texmin dikim ku ci ye? Carna tu bi xem û xeyal büyi. Tê bizviri. Belê tê bizviri?

FERHAD- (Serê xwe dike ber xwe) Ez mecbûr im... û dixwazim. Lena! (Lena hemêz dike) Zedetirin ihtiyaciya min bı wê derê heye niha. Divê ez alikariya gelê xwe bikim.

LENA- Lé ez é ci bîbim? İhtiyaciya min ji bı te heye.

FERHAD- Lı ciheki... wexteki. (Herdu bı hev ra distirê)

LI CİHEKİ, CAREKİ DIN

Gava meriv berpirsiyariya xwe zamibe li hember malbat û hevalan divê meriv lê poşman nebe, nereve û ixanet neke.

Bı sondeki giran û pirozbahi sond dixwîm, ez é ji dil ji te hez bikim heta ku em hev bibinin.

Ki dikare bêje li kêderê û ci çax.

(Vegerin)

Lı ciheki, gava strana azadiyê tê bîhistin, wê çaxê em dîzvirin û hev dibinin.

Eger zeman dijwar be ji, hemû, insanek iqna bibe eger ew hez bice, derheqa hezkîrinneki dijwar da hêvi dide me.

Eger niha tu dev ji min berdi divê ez hurmet bikim, lê eş peyda dike ku meriv bêdeng mecbûrê qebûlkiri bibe. Lé ez dibinim ku sedemén te hene tevi wi ji xatîrxwestin dijwar e.

(Vegerin)

DAWI

SARE TOŞ

MÜNZÜR ÇEM

Waxtê vaşturiye bi. Cêw qêdav, sîre kêtiv genim. Ha ewro ha meste dest nêne deyra ki. Tij corde bereqiyêne, asmên biv zê soja sûr e. Têsanê ver hard qilaşavi ra, parce perçe bi. Çemûzû çize çizên canêverdêne, kütik kêtiv cawonê honikû cîra nêvêjiyêne. Hondeke mecbûr nêmend, teyrû şiya xorîye terknêker-dêne.

Eke şîye biye kîlme, amê kewte binê darû û tede amê pêser, Silêmanê Pilvankız qeva pêyêne ki nêro, vaştûriya xo gûrete hetê çeyi ser şî. Hen zêde bivi bûlik ke dez kêtiv wertê hermü. Rayê ra hermê xo hen na taday, nahêt dohêt ser ard-bêrd, vilê xo müşta, wast ke tenê rawûrosnone. Nara o sîrede heto zûra ki baxçede nada nada û xo ve(be) xo vake:

-Hala rîyê têy nade, çond rojo daru ra qet pele nêlêwina. Tî vana kile kewta dina vêsnena. No senê çîyo nanêno?

Pêyê coni ki honde nada ke nawo amo vayê ser. Lîngu hen gurettiv ardiv uza. Hama eve lerz bi çewt, dest û riyê xo şut. Zeke bira rast ki awe hen corde rişiyero ser, nahêt dohêtê vilide şîye cér û lese kerde hite. Çî esto ke êy gos ro ser nêna. Lesa dêy biyêne honik e ya a cîrê bese biye. Uzay ra têpa, goza ke hen ci ra new des gami dot biye tekit şî binê daye, mereda ra eve dest, cîmê xo gûrêt û hen vînet. Wastke tenê raworeşiyone, ora dîme hona şero perojiya xo bûro.

Çî esto ke têsrî qefelayê ver, hen rew pa şî. Uzay ra gore ki, waxto ke domonê veng fiştra xo vake:

-Eskêr naye yênenê, tenê herêy ame ra xo.

Pêye çoni ki hen üst ra xo ser perskerd vake:

-Nêro kûyê kotra yênenê?

Lazêk heto serê misna ra ci û vake:

-Aha nade hayê hazade yênenê.

Ayêde Silêman cêra ra, hen ze tenê cîmê xo pîspisnay ra nada, vatena layik raste biye. Dî es-

kêr hayê kêtiv ra raye amêne. Zêde nêmend eke amêy tê ri, eskero ke verdero destê xo berd kepa xo, selam da û vake:

-Qimendarê mi venga to dano, vano " Hala bêro qereqol, karêde mi têy esto êy qesêyken.

Silêman hen ze tenê sas kewt ci, cîmê xo eskêr se ra ranêvûrnay û pers kerd vake:

-Mi wazeno? Hama nika?

Eskêr vake:

- Ya ya to wazeno to wazeno, tenê lerze bîke.

- Pêki, vake Silêman û kewtra raye tekit şî. Seke çêverê qereqolde kewt zere, qimendarê Türk ra ame tê ri, xofo ke zerede ro hen ze tenê bi zêde. Mordem raste vazo tenê ki tersêne. Qimendar hama na eve lerz ci ra venga ci davi eceva? Naraye ci ra ci wastêne? Werdena eskêr qêdavi, sava daye qesey kerdêne? Ya ki eve xo rayê ra şiyêne wastêneke o ki têy şero. Kam ci zoneno belka sevevê vengdayêne qet nayine ra juye ki nêbiye. Sere sera hirisuhêst biye û Dersim'deki firtine vêjavî. Her ci kêtiv ra têwerte, her ci ser û bin biv. Her ci destê eskerê Türk de bi. Heyatê isoni ki tede, her ci girêdayîyê zu çekuyê wertê lewone dine bi. Rozê ca-verde, saatê re dîme ci biyêne kêş nêzonêne. Eke Silêma uza hen nayê sero vînet, zerê xo de na na vûrnê ra, qimendarê qereqol qet ci rê wayir nêvêja. Tî vana belka kes çêverde namêv zere. Werte ra ke xêlê vêrd ra hen verê xo çarna ra ci xaftela vake:

- Xêr ama Silêman efendi.

Ey vake:

- Xêr mîndime qimendar beg.

-Hala dî hirê deqê bin vînde, na karo ke mi destê ez êy ki bîqedeni ora dîme qesêykeme. Silêman cûwav nêda û hen bêveng vînet. Waxtoke qimendarî kaxita verê xo noşnê (nîvisna), êy ki cîmê xo hen fetelnay, hurdi hurdi dormê xo de nada. Gorê verê coy oda qimendarî de

çiyê de newe çinebi. Her ci zê virên osêne. ci esto ke zeke pêyê masa de çimê xo gina ra çuwelonê verê dêş ser, xafsla tı vana ke zere ñe çiyê vişa ra. Rengê xo hen şî, mordêm vatêne bêlka gon lesede nêmenda. Hata nika çutur yê nêdiv, çutir hayiro ci nêbi sas kewt ci. Sîlêman yê çûwal rind naskerdêne, ci tedero rindek zonêne. Hata roza ewroyêne çond rêtê yê div, çond rêtê dine sero qeseykêrdîv. Xo ve xo pila vake:

- Belka naraye zê virên niya, beno ke çûwalûde çiyêde bin bîbo.

Uzay ra dîme ki sarê xo pêyser berd, çime xo çarnay ra poştâ boni ser, zerê xode vake:

- Heqo! Tiya ke cor vineta ma ser de nadana, tiya ke comerd a, wayirê çor kosêy dinawa, nayê ve (bi) mi meke, reyna min û yê zîlim i miya tê ri.

Zeke Sîlêman na qesa xo qedena ki xafsla veng kewt ra qimendar, pers kerd vake:

- Ma endi zovi ci esto ci çino Sîlêman efendi? Hawo çond rojo çimê mi ra to nêgîneno. Kota, sekena?

Sîlêman, destê xo nahêt dohêt ser kêrd ra, hermê xo voro hetê vilê ser ont û vake:

- Ma ti nêzonena, xamê dewona. Waxtê karo, waxtê vaştûriyo. Xorê hen kari dîme kas beme some. Ma endi zovi ci vaji ez?

- Beme rînd, beme rînd. Zêde nêmendo ke ma têde rînd bime qet ti merax meke. Nêjdi, na wetano rindek o zê cenêt xiraviye ra keme pak. Endi senik mendo ke koke ro hêydutu bêro bîrnayêne. Dest ve heq ra roza nêzike de têde pa xeleşime.

- Ma savajine, insala têde beme rînd, vake Sîlêman.

Qimendar, ayde xo ve xo vaja pede, hen ze tenê eve hêrs qeseykerd, vake:

- Ninû ma zof qefelnayme Sîlêman efendi. Di sero na kowûrayme, heroz dame pêro, heroz keme pak, onca ki koka hêydûtû nê brina. Nê hen çiqas zofî biyê mordem saskûno ci.

Dûstê na qesa nêwiye Sîlêman çiyê nêvake. Hama Başçawîs hen dosbîvi ke qet nêvînetêne: Hem qeseykerdê, hem ki eve dest boyna dêne masaro.

- Pêsekene, xizmeta wetana işte. Sava hûzûrê milêt, dewleta ma hata roza ewroyêne ci ke dest ra ame aye ra têpa nêmende û fedekarêna gîrse kerde. Na ra ki hen beno. Her tim yêno aqilê mi ez xo ve xo van ' Eke nê hêydût nêbiyêne, herkêş qanûn û nizam rê hûrmet bikerdêne, ma ki itawû namêne, amrê xo na kowû sero ranêvarnêne, çiqas rîndbiyêne. Na

êşqay isoni niyê? Nê qêy qanûnê dewlete pê-nêcénê? Qêy kewtê ra xiraviye dîme canêverdanê? Yaa, Sîlêman efendi, na qesê nanêñ her tim yêne aqilê mi. Ma onca ki tûwa nêbeno. Sava emniyeta dewlete, sava rîndêna milêt, çiqas ke icav kerd ma gereke honde itawû vindime. Yê ma xorê xizmeta rîndêna, heq zo-neno ke fîkrêde mawo xiravin çino. Raya ke pilê milêtê ma Atatürk misna ra ma, ma xorê aye pê-cême some. A ki raya insanêñ û medenêt a.

Sîlêman hen zêde pêyser nêşî, Ciyo ke na diseronê pêyênu û amo meyda, kerdena ke eskêr ve milêt kerda a arde çimonê xo ver, daye sero vinet, pêyê coni ki ze tenê eve qûrnazên qimendar de nada û vake:

- Vatena tûya qimendar beg, nêqêdinê nêqêdinê, Hêydût kowû sero nêqêdinê. Dûstê nayede qimendar sarê xo sana ra, vake:

- Zeke ti nêvana zofê. Zofê rê zofê hama lerze meke nêjdi pêniya dine yêna.

Hama zeke vatena xo qedenê, nara ki vilê xo kerd ra derg, hetê çêvîr ser nada, qira vake:

- Hala lazê mi sima kam uzarê, rêtê nahêt ser nadê.

Zeke êy hen va, hama onbaşı çêverde kewt zere, selam da wake:

- Emir bike qimendarê mi.

Qimendar eve çimû çûwal misnay ra ci, pêyê coni ki vake:

- Hala nayine rakerêne Sîlêman efendi têy nado, tuwa werte ra kês naskeno? Eke nasbikero qeke nê namu miseme.

Onbaşı pêyser cêra ra, venga hevalê ki xo da ard, ora dîme hama bî lerz fêkê çwalû kerd ra. Sarê Dêşmonê ke lese ra ci ra kêrdîv vêt, verê dêşte têlewede nay ro.

A deqade ti vana ke destê kewtiv qırıka Sîlêman, nefes ro ci bîrnav. To vatêne ke Sîlêman endi xenokino. Araq kewtiv ra lese ser, sene zê püfîke ûstêne ra niştene ro, zoni bînede recefiyêne. Ci esto ke zêde nêmend ame ra xo ser. Ame aqil ke, eger qimendar hayirê ci bo ke hen zêde biyo rehetsiz, yaxe ro ci ceno. Bêlu nêbeno, xafsla tı nadana ke vake ' ti ki dinerawa û çiyêde bin nêvake. Hama onca kerd nêkerd besenêkerd ke çimonê xo dine ra durfiyone. Hala wertede zu bike vinetê vinetê, boyna dêyde nadêne. Pêniyede ki hen kelebêrbis bi, zerê xo de boyna vaja pede, vake:

- Wax wax wax, hêfê mi bêro torê, çê to bîvêso Toso. Torê Sêbi, ci xirave torê amê ke ti kewte ra nayine dest? To xo fişt ra dest û sarê xo da. Ma to besenêkerd vozdê? Demeke besenê-

kerd to, besenêkerd û na raye sarê xo da.
 Eke werte ra tenê vêrd ra ki qimendar perskerd vake:
 -Tuwa wertede naskerdoxê to estê?
 Silêman verê coy vengê xo nêvet. Zere ra namêne ke vazo 'ez na mordêm nasken'. Pêyê coni ki têpa xo ve xo vake:
 -Ma ez vengê xo ne nêvaji ci ra ci vêjino. Sayê ke Tos pêyser yêno, yake iyê bin?
 Cêra ra qimendar ser, vake:
 - Werte ra jûy zonen.
 -Kameciyo?
 Silêman destê xo kerd ra derg, sarê Toş misna ra ci vake:
 - Na xort nasken. Demeniz o no layek, namê xo ki Tos o.
 -Çîko çîko, vake qimendarê Tirk? Hem pers kerd hem ki hen zê tenê pê huya.
 Silêman rîyna vake:
 - Tos o. Dêy ra vanê Toso Demeniz.
 - Ma zovi, zovi kêş nasnêkena?
 - Ne! Kêş nasnêkena vake Silêman.
 - Hala hala, ma nê mordemê na wertonê, çûtûr beno ke ti xo ra ci ra jûy naskena?
 - Ma savajine, hata roza ewroyêne qet çimê mi ra na mordemonê binû nêgîno.
 Xamê, herhalde cawonê binu ra amê.
 Qimendari naye sero sarê xo sana ra û vake:
 - Sekenê bikerê, kot ra yênen bêrê, ma dest ra besenêkenê xo raxelesnêne. Pençê qanunê dewlete ra xeleşayêne mumkune niya.
 Eke êy hen quesêykerd Silêman verê xo çarna ra hetê bin ser, raya ke dewe ra sera tever sona daye de nada û çimê xo hen pira mînd. Saye ke Tos têpa uzabi. Uza niştivro dêyde nadêne. Zêde nê hona hirê roj ra avêbi. Tos ve tayê hevalonê xo ra pa amêv çê dêy de biv mîyman. Yine cirê sifre naviro, mîymanu pizê xo kêrdîv mîrd û ustiv ra tekîtiv şiv. Cawo ke şiyêne ki têpa koyê xûyê delal bi. Ci esto ke zeke yê kêtiv ra raye, Silêman nadav ke yelega xo hurênd de çina. Zonav ke na karê Toş o. Hema kêtiv ra dîme û venga ci dav. Tos dur ra cirê wereza amêne. Uzayra gore ki ci ra vatene wereza. A raye ki hen kêrdîv û vativ;
 -Wereza çimê to wen, yelega mi mebe caverde. Ci esto ke Tos gos ro ci nênav. Ma Tosê Demeniz qet gos nêne ro çiyê henê ser? Cirê yelegê lazime biye a ki div, ora dîme qet caverdene. Slêman se kêrdîv nêkêrdîv, Tos zê peskoviye perav ra şiv. Eke têy çare nêdiv, na raye ki cêravi vero vativ;
 - Çimê to wen wereza. Nifisa mi cêvde ra, eke

yelege sera ki aye caverde. Waxto ke eskêr ame kerde saye eke mevêno, mi benê erzenê ra dare. Sarê mi cirakenê çêvesaye.
 - Na qesi sero Tos dota hûyav û vativ:
 - Nê xalo. Ez aye ki canêverdan. Caneverdan ke eke zû kaxite sero sarê to cirakenê va şêrê cirakerêne.
 Heto zû ra na vativ, heto bin ra ki eve hûyayis Pilvank terkêrdîv kêtiv dur û tekîtiv şiv.
 Eke na na arde ra xo vir, zerê xo de pila vake:
 Toso çêvesaye Toso. To mi ra vake sarê to cira kerêne, ti şiya to yê xo da. Way way way, werezayê mi, leya têjiye way. Hêfê mi bêto torê ke to naraye besenêkerd xo kafir dest ra raxelesnêne. To besenêkerd û sarê xo da.
 Ayê de vengê qimendar rîyna ame vake:
 - Ma eke werte ra zov kêş nasnêkena xorê so.
 - Ya, eke müsade kena ez şêr. Ti zonena dewiz gereke roza ewroyêne de zof bigûreyêne.
 Hama zeke qese qedena ki xo çarna ra kewt ra raye. Ci esto ke ,waxto ke çêver ra gama xo berzo tever, qimendar pêy ra venga ci da. Sileman eve ters cêra ra ser û vake:
 -Bûyûr beg.
 -Ti zonena, karê erzaqi de rew kêmaşen vêjina. Ti onca marê sava werdene çiye peyda bîke. Destê ma de tenê bij û miyê ke hêydütû ra amêv gurêtene bi, yê ki aroze tabûre waşt ma dinerê fişt ra raye rusnay. Axiri endi ti çiyê ana hûrê.
 Silêman diqet kerd vengê qimendar tenê ecayiv bi. Nadayêna xo ki hen rînde nêbiye. Çimu ra xayinêni rîjyêne. Ti hen zonena ke vatê :
 - Uwoke ma sima nêkiştê hona wûşê, sima ki gereke marê xizmete bikerê. Çike sima marê dêndarê.
 Slêman seke o halê dêy hen di, tenêna zêde wast ke çiqas dest ra yêna honde zêde ecele ûza terkero. Uzay ra gore ki Qimendar ra vake:
 - Temam ez halken û bi ra rast şî.
 Çutur qereqol ra bitever, raye çûtûr qedenê ame çê, hayiro ci nêbi. Hem ame hem ki xo ve xo vake:
 - Pêsekenna Toso. Hükîm zalîmu destde ro. Iye ke ma qırkenê, iyê ke sarê ma lesa ma ra cirakenê, pizê dine mîrdkerdeneki têpa vilê ma serowa. Fermadoxonê xo, gereke ma ve xo weyiye kérime. Na, Dersim'de bedelê heyata Toso. Bedelê heyetê ison! Hala rîyê saye a ki perekenna. Hala vînde rîyê a ki merdene dest ra ma xelesnena ra?



BIHA: 10 Skr